

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

HAVÎNA 2005an

Celal Talebanî bû
serokdewletê Îraqê

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve/ Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 27, havîna 2005an

Ansvarig utgivare
Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Navnîşana li Almanyayê

M. Özgür
Birnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln/Almanya
Tel: 0049-(0)172 298 24 51

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2 500 000 TL.

Abone (ji bo du salan - 2 yıllık bedeli):

Swêd: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası

M. Özgür, Stichwort "Birnebûn" Deutsche Bank-Köln
TL: 0049-(0)172 298 24 51
Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin / Dağıtım

Türkiye

Ankara:

Nedime Yalınkılıç /Cafe Babil
Selanik Cad. No 50/6 Kat: 2 Kızılay
Tel: 0312-418 10 50

İstanbul:

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB



Şeva gundê Celikan

Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê
re tên, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî,
li xwedî nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela
Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.



Perwerdeya bi zimanê kurdî! <i>Ali Çiftçi</i>	2
Şeva Celîkan-Kirkpinarê	8
Şeva çandî ya Xelîkan (Qerejdax) li Witten-Almanyê	10
Şeva şênawîyê Kurdên Anatolîyê li Stockholmê	15
Hêjayiya xebata kurdên Anatolîyê, <i>Keya Îzol</i>	24
Daweta Stockholmê, <i>M. Xelîkan</i>	25
Celal Talebanî kî ye?	27
Hiqûqa Ewropayê û pirsgirêka kêmnîetewan <i>Nebî Kesen</i>	37
Roja jina ya bêkuteq, <i>Nûh Ateş</i>	40
"Kerkûk tirk e!" "Konîya kurd e!", <i>Nûh Ateş</i>	42
Çîroka li bin baranê, <i>Yusuf Yeşilöz</i>	44
Hevpeyvîn bi Ömer Sarıhan re, <i>Sefoyê Asê</i>	49
Desteyek kurtenivîs, <i>Mîrê Derewa</i>	54
Li Stockholmê pêşangeha kilîmên Kurdistanê, <i>Ali Çiftçi</i>	57
Germikê (Arşincî), <i>Amadekar: Sefoyê Asê</i>	67
Merşeka kurdên Anatolîyê li Swêdê (1893), <i>Rohat Alakom</i>	68
ÇÊTÎR, <i>Mem Xelîkan</i>	70
Stranên Gelêrî, <i>M. Xelîkan</i>	73
Orta Anadolu Kürtleri, <i>Şeyhmus Diken</i>	76
"Kürd-Der Genel Başkanıyla söyleşio <i>Vahit Duran</i>	79
Zaro Ağa'nın halefi Erzurumlu Kürd Ali, <i>Mehmet Bayrak</i>	86
Baskın Oran'ın Kürt Sorununa Yaklaşımının Bir Eleştirisi, <i>Nebî Kesen</i>	90
Fêrbûna zimanê kurdî (II), <i>Mûrad Ciwan</i>	95

Perwerdeya bi zimanê kurdî!..

Xwendevanên birêz, em bi hejmar 27an a havîna 2005an dîsan bi hev re ne. Di jîyana gelên bindest de rojên xweş, xeberên xweş pir nabin! Lê, îro em dibînin rewşa me kurdan li gor salên borî her ku dice ber bi hêvîyeka serkeftinê û peyder pey ber bi başiyê ve diçe. Ev, helbet bo gelê me bi temamî xeberên xweş in. Dem hatiye êdî em jî ji berpirsiyariyên xwe bi dûr nekevin, hêvîyên xwe yên pêşerojê hê xurtir bikin, doz û daxwazên ku li ber me ne, em bi hev re mil bidinê û bi pêş xin.

Di jîyanê de divê meriv pozîtîv bifikire. Dema însan pozîtîv difikirin, dibin xwedî biryarên erênî û dema biryarên erênî jî hatin dayîn, helbet meriv digihê encamên baş. Ji encamên baş jî mizgîniyên xweş belav dibin!..

Ji ber vê yekê jî hûn dê her xeberên xweş yên ku dilê însanên me şad dîkin di vê hejmara havînê de bibînin.

Bi hîlbijartina serokdewletê Cumhuriyeta Iraqê ya Federal birêz Calal Talebanî ne tenê ji bo kurdên Kurdistanê Iraqê, her wekî hemû kurdên ser rûyê erdê ji bo me, kurdên Anatoliyê jî serbilindî û şanaziyeka mezin e. Ji bo munasebeta hîlbijartina serokatîya birêz Celal Talebanî hûn dê di vê hejmarê de bibliografiya wî, bi sernivîsa *Celal Talebanî kî ye?* bixwînin. Birêz Mûrad Ciwan ev bibliografa jî soranî, ji rojnama *Kurdîstanî Nwê* wergerandiye kurmancî û hin agahiyên din xistine serê.

Xwendevanên birûmet, dema kovara me di sala 1997an de hejmara xwe ya yekem derxist, ji aliyê hinekan ve dihat gotin ku dê sê-çar hejmar derkevin û dawî ê bê. Heta car car me bi xwe jî digot, gelo em dê bikaribin deh hejmaran derxînin da ku bibe cavkaniyeka di derheqê kurdên Anatoliyê de. Lê wisa nebû, hejmar bi hejmar naveroka kovarê dewlementir û pêwistiya berhevkirina folklorê û xweifadekirina di kovareka wiha de her ku cû zêdetir bû. Wexta em hejmarên destpêkê û yên niha didin berhev em dibînin ku hem nivîsandina kurdî di nav kurdên Anatoliyê de pêşketiye hem jî rûpelên bi zimanê kurdî zêde bûne.

Ne tenê ji aliyê ziman û nivîsandinê, ji aliyê xweorganizekirinên civakî de jî em dibînin ku bi derketina kovarê re hem li welêt û hem jî li derweyî welet, bi taybetî li welatên Ewropayê kurdên ji Anatoliya Navîn xwe birêkdixin, komelên gundên xwe ava dîkin, bi navê gundên xwe tên ba hev, bi hev re civîn û şevên şênawiyê li gor irf û edetên xwe bi ziman, folklor û muzika xwe pêk tînin, wek dawetekê bi hev re derbas dîkin. Bi hev re yarmetiya însanên xwe yên xizan dîkin, ji gund û warên xwe re îmkanan peyda dîkin, bi kurtî alîkariya hev dîkin û bi xebatên wiha re jî çand û zimanê xwe jî diparêzin!..

Di mehên bihara derbasbûyî de li gelek bajarên Ewropayê şevên gundên

cur be cur hatin çêkirin. Hûn dê di vê hejmarê de xeberên çend gundan, herwiha yê Waqfa Kurdên Anatoliyê ku bi kovara me, Bîrnebûnê ve li bajarê Stockholmê hatibû kirin bibînin.

Di nav hemû ew waqîf û komelên ku bi navê gundan hatine ava kirin, em dibînin ku her xwedî derketina mîrasiya çand, dîrok û parastina kesayetiya xwe heye, heta ew ji xwe re kirine bingeh. Ew jî hêvî û heycanekê dide me.

Belê, bi sedan sala ne ku di jiyana koçberiyê de mîletê kurd nesil bi nesil, bê xwedî ti mafên kesayetiya û neteweyî, xwe gihandiyê heta vê rojê û karibûyê ziman û çanda xwe jî biparêze.

Ev hemû xeberên xweş in. Îro jî neviyên vî mîletî xwedî li ziman û çanda xwe derdikevin, li hember wê teknolojiya nû ku bi sedan ziman li ber wendabuyîne ne, dîsan karibûne xwe bigihînin wê teknolojiya nû jî û di vî warî de jî em dibînin herçiqes zaaf û kêmasiyên xwe pir bin jî, di wî warî de jî ciyê xwe girtine.

Lê gelo parastin û pêşxistina zimanekî ku bi neslan heta roja îro pê perwerdeyî nehatibe kirin, bi tenê ew xebatên ku li jor me bi rêz kirin dê mûnkun be?

Bi ya min, na! Têrê nake. Divê em rojekê pêş de xebatên berbiçav yên ji bo perwerdeya bi zimanê kurdî bo zarokên xwe, hem li welatên Erwopyayê û hem jî li welêt bidin ber xwe, organîze bikin di nav wan komele, waqîf, belediye û komên civakî de, pêwistiya perwerdeya bi zimanê kurdî û girîngiya zimên, di kesayetiya zarokên kurdan de çiqas muhîm e, bînin ziman

û wek *seferberîya perwerdeya bi zimanê kurdî* destpêbikin.

Berê, me ji bo zimanê kurdî digot; bila zarok bi zimanê zikmakî yanê yê dê an zimanê malê perwerde bikin. Lê, em niha dibînin ku ev herdu term/gotin hêdî ji bo kurdên me yên Tirkîyê derbas nabin. Ji ber ku êdî ne dayîka kurd bi zimanê xwe dizane û ne jî mîrê kurd, bi taybetî yên Tirkîyê li malên xwe bi kurdî deng dikin û ne jî ew kesên ku xwedêgiravî rewşenbîr in an xwe berpîrsên dawa kurdî dibînin, bi hev re kurdî deng dikin!.. Ji ber vê yekê jî ez raste rast dibêim: em dawa perwerda zimanê kurdî hem ji bo zarokên xwe û hem jî ji bo dayîka kurd daxwaz bikin!..

Êdî meriv çî li gundan û çî jî li bajarên be, zarokên kurd ên ku bi hev re kurdî deng dikin nabîne. Însanên me nikarin xwe bi zimanê kurdî îfade bikin, bi taybetî jî di nav neslê nû de!.. Gelo ew ne jenosîda/qirkirina zimanekî ye! Ma ew çî ye?..

Erê, ew meselên zimên jî xeberên ne xweş in!..

Lê, hêviya me her heye. Ew daxwaza me hemû kurdan e. Dema ku îmkân hebin, êdî însanên me bi riheftî xwedî li çand û zimanê xwe derkevin. Divê hemû komele û rêxistinên civakî bi hev re di vê dema niha de ku Tirkîye dixweze bibe endameka YE, pir vekirî daxweza perwerdeya zimanê kurdî ya resmî bêt mobîlîze kirin!..

Bi hêviya havîneka xweş, heta hejmarê bê, bimînin di xêr û xweşiyê de!..

Saygıdeğer dostlar,

İki yıla yakındır doğduğum Şemşik köyü ve Kürecik nahyesi üzerine bir çalışmam var. Bu yöreye Binbaşı Noel gitmiş ve rapor tutmudur. Bîrnebûn dergisinin 24. sayısında Noelin gezdiği yöre ile ilgili bir harita var, bunu kitabımda kullanmak istiyorum. Bu haritanın bilgisayara taranmış şekli sizde var mı, ya da temiz kopya var mıdır? Bu hususta sizin yardımınıza ihtiyacım vardır.

Ayrıca bir çağrım var, yayınlarsanız sevinirim:

Akçadağ'da, Şemşik'de ve Kürecik'de göç edenlere çağrı

Ben Şemşik'te (Şamışkan) doğdum. Şemşik köyü Kürecik nahyesine, Akçadağ (Arğa) kasabasına, Malatya iline bağlıdır. Şemşik ve çevresi üzerine bir

kitap hazırlıyorum. Osmanlı döneminde ya da sonradan göçen Şemşik, Kürecik ya da Akçadağ'dan aileleri arıyorum.

Bilmek istediğim göç eden ailelerin soyadları, hangi aşiret veya kabileye bağlı oldukları ve şimdi buldukları coğrafik yerleri.

Yardıminız için şimdiden teşekkürler.
Saygı ve sevgiler

Şahin Aydın

İlişki adresi

Şahin Aydın

Postfach 100124ö 46201 Bottrop /

Almanya

Fax. 0180506033406811

Cep tel. 01794262483

e-mail:info@sahinaydin.de

www.sahinaydin.de

Mizgîn'den selamlar, saygılar

Değerli Bîrnebun dergisi çalışanları, Sayfanızı Anadolu'ya sürgün edilen Kürtlerle ilgili bir araştırma sırasında gördüm ve sizleri tanımak istedim. Adım Abdülbaki Yetik. Diyarbakır merkezli TOPLUM-DER isimli bir derneğin genel sekreteriyim. Ayrıca 9. sayısını çıkaracağımız Mizgîn dergisinde yazıyorum. Mizgîn dergisi bizim Diyarbakır'da çıkardığımız bir dergi.

Daha ayrıntılı bilgi ve derneğimiz hakkında bilgi edinmek için www.mizgin.net adresine bakabilir, linkleriniz bölümü için değerlendirebilirsiniz.

Ayrıca dergimizde "Sürgün Kürtler" konulu bir dosya açacağız bunun için bize yazı ve döküman gönderirseniz seviniriz.

Sitenizin çalışmalarını beğendim. İnşallah daha nice güzelliklere vesile olur.

Yayın hayatınızda sizlere başarılar diliyorum.

Abdülbaki Yetik

TOPLUM-DER

Genel Sekreteri

HECÎLERA KOMEL AVA KIRIN

Gundîyên Hecîlera li Danîmerkê, bajarê Kopenhagê komelek avakirin. Hecîlera gavake cimaetî avetin û bi navê “Komele Fona Defnkirin û Hevgirtin” komelek ava kirin. Avakirin û îdarekirina komelê ji alî wan kesan da destpêkir.

Ömer Yüksel, Mehmet Acı, Halil Yıldırım, Mehmet Kömürçü, Yusuf Avcı, Ali Koyuncu, Necip Önder, Ömer Çelik, Ramazan Çoban, Mustafa Kara-

osman, Mustafa Baran, Orhan Çoşan, Mehmet Peker, Kazım Duvarcı.

Navnişana Komelê: Ömer Yüksel, Baekkelumden 2660 B. Strand-Köbenhavn DK

Em ji wan ra serkeftine dixwazin. Armanc ew e ku gundên me yên din jî dezgehên xwe ava bikin û di nav wan komelan da yekîtiyek çêbibe.

Îrfanê Amo
yê malê Heciomerî Karrê.

Daxuyaniya Navenda PENa Kurd

Navenda PENa Kurd bi tomeriya endamên xwe ji dînen curbicur sersaxiya Xaçparêzên Katolîk ji ber koçkirina dawî ya John Paul II dixwaze.

Papayê Xwedê jê razî bermayiyek fireh li pey xwe hiştiye, ji ber ku ew herdem digel mirovên dilxem bû.

Serokê Dêra Katolîk ji xwe nunerê neteweyekî bû, ku di dîroka xwe de ji parçebûn û bindestiyê çerçiribû. Lewma wî karîbû çareyeke aştiyane nîşanî mirovahiyê bide, çawa hêza giyanî û helwêsta bêtirs mirov û gelan ji zordariyê rizgar dikin.

John Paul II sûcên gerdûnî bi eşkere şermezar dikirin, wek kîmiyabarana sala 1988an li dijî kurdan.

Bangewazî û gavên wî yên berbiçav rê li ber gelek şeran girt û jiyana mirovan misogerkir Hem li kampa sosi-

yalîst ya caran, hem li Amerîka Latînî, hem jî li deverên din yên cîhanê.

Gava Papayê rehmetî bi dehan zimanan diaxivî, wî wekhevî û yeksanîya neteweyên, ku li ser rûye erdê dijîn, tekez dikir.

Gava Papayê rehmetî gotûbêjên tev dîn û olên din rewa dikirin, wî cezwerên hevbeş yên mirovahiyê bi ronî dikirin.

Gava John Paul II kesê, ku bibûya kujerê wî, bexşand, wî alavên aloziyên di navbera bawermendên dînen cezaw de vemirandin.

Navenda PENa Kurd hêvîdar e, ku berpirsyarên siyasî û dînî wê li ser şopa Papayê bimînin û kiryarên wan li ser bingeha mirovhezîyê bin.

Navenda PENa Kurd

Birêz Celal Talebanî

Serokdewletê Cumhuriyeta Îraqê a Federal

Bêxda

Bi minasebeta hilbijartina cenabê we ji bo serokdewletiya Cumhuriyeta Îraqê em bi dil û can we pîroz dikin.

Hilbijartina we ji bo serdariya birêvebirina Îraqê ne tenê ji bo Kurdên Kurdistana Îraqê, her wekî hemû kurdên ser rûyê erdê ji bo me kurdên Anatoliya Navîn ji serbilindî û şanazîyeka mezin e. Civaka kurdên Anatoliya Navîn ku perçeyek e ji miletê kurd bi vî kurê miletê xwe yê hêja îftîxar dike.

Em dizanin ku ev encam ji biryardariya têkoşîna miletê me yê Kurdistana Îraqê û yekbûna wî bi hemû partî, rêxistin û dezgeyên wî yên

civakî tê, ku cenabê we yek ji rêber û demezrînerê vê yekbûna neteweyî ye. Yekîtiya neteweyê kurd li Kurdistana Îraqê û serkeftinên we yên ku encama vê yekîtiyê ne em kurdên Anatoliya Navîn jî xurtir kirine û em pirtir bi miletê xwe ve hatine bestin û temamkirin. Ji her demê bêtir em îftîxar dikin ku em perçeyekî ji vî miletê têkoşer in.

Di karûbarê cenabê we de a ji bo rêberiya Îraqê ber bi dewleteka federal a demokratîk û yekbûyî, em ji bo we serkeftinê dixwazin, piştgiriya xwe tevî silavên xwe yên ji Anatoliya Navîn pêşkêş dikin.

Mahmud Baran

Serokê Weqfa Kurdên
Anatoliya Navîn

Ali Ciftci

Berpîrsê Kovara Bîrnebûn
(Kovara kurdên Anatoliya Navîn)



Birêz Mesûd Barzanî

Serokê Partiya Demokrat a Kurdistana Îraqê Selaheddin

Bi minasebeta hilibijartina birêz Celal Talebanî ji bo serokdewletiya Cumhurîyeta Îraqê a Federal em cenabê we jî bi dil û can pîroz dikin.

Em dizanin ku hilibijartina birêz Celal Talebanî encama biryardariya têkoşîna milletê me yê Kurdistana Îraqê û yekbûna wî bi hemû partî, rêxistin û dezgeyên wê yên civakî ye di serî de ji ya PDK û YNK. Me baş agahî jê heye ku cenabê we yek ji rêber û demezrînerê hestberz ê esasî yê avakirina vê yekbûna neteweyî ye.

Yekîtiya neteweyê kurd li Kurdistana Îraqê û serkeftinên we yên ku encama vê yekîtiyê ne, em kurdên Anatoliya Navîn jî xurtir kirine û em pirtir bi milletê xwe ve hatine bestin û te-

mamkirin. Ji her demê bêtir em îftîxar dikin ku em perçeyekî ji vî milletê têkoşer in.

Di karûbarê cenabê we de a ji bo rêberîya tevgera parastin û pêşdebirina maferewayên milletê kurd li Kurdistana Îraqê û rêvebirina hemû karûbarên Iraqê ber bi dewleteka federal a demokratîk û yekbûyî, em ji bo we serkeftinê dixwazin, piştgiriya xwe tevî silavên xwe yên ji Anatoliya Navîn pêşkêş dikin.

Mahmud Baran

Serokê Weqfa Kurdên
Anatoliya Navîn

Ali Ciftci

Berpîrsê Kovara Bîrnebûn
(Kovara kurdên Anatoliya Navîn)



Şeva Celîkan-Kirkpinarê



Komela Celîkan-Kirkpinar, bi navê “Festîvala Dostaniyê” 27ê Adarê 2005a li bajarê Hollandayê Rijswijk şevêk çêkir.

Şev bi xeberdanên nunerên komîtên liqên Almanyayê, Danîmarkayê û Celîkan destpêkir. Nuneran di xeberdanên xwe de, bi kurtî qala xebatên xwe yê n ji bo gund kirin û encama bexş û me-

haneyên ku ji aliyê endamên komel û dostan ve berhevbûyî dane xûyakirin.

Di şevê de wek mêvan serokê belediya Celikan Mehmet Altun jî xeberdanek kir. Altun di xeberdana xwe de bi taybetî li ser pirsê ava vexarinê rawestîya. Altun jî bo ava vexwarinê a ku nû hatî ditîn, ji hemgundiyên xwe alîkarî xwest û qala projeyên ku bele-



diyê dayî ber xwe kir. Her weha Ahmet Yaşar jî, li ser dîroka Celîka xeberdaneke dirêj kir.

Şeva ku wek hunermend Murat Çiftçi, Cella Yıldız, Günay Tunç, Murat-Recep Ercan tevlîbûyî, komeke

zaroka a govendê jî listikên xwe yên ji hêla Amedê nîşan dan. Şeva ku nêzî 700 kesî tevlîbûyî li dora saet 11ê şevê xilas bû.

Ayhan Kuz



Şeva çandî ya Xelikan (Qerejdax) li Witten-Almanyê



Şeva Çandî ya Xelikan (Qerejdax) ya sêyemîn bi şîara "Bo Xelikeka serfiraz û dewlemend" li Wittenê bi tevlêbûna nezekî 400 xelikîyan bi çoşeke mezin pêk hat.

Şevê di seat 17.30an de, bi axaftina serokê Komela KARA-WITT, Tahsin Demirsoy, destpêkir. Tahsin di axaftina xwe de li ser karê ku komelê heta îro kiriye dastî. Ji bo peşvaçûyînê û xebatên mezin verin lidarxistine û yêki-tiya komelan çêbikin, Tahsin banga

li her du komelan kir. Piştî re hunermendên Kurd Ellend, Gulê û Serya derketin ser sahnayê û bi stranên xwe yên xweş di şevê da cih girtin.

Lekolînavan û nivîskarê Xelika birêz Nuh Ateş, di axaftina xwe de li ser dîroka koçberîya xelikiyan a ber bi Ewrûpayê û rewşa Xelikan a sosyal û çandî sîkinî.

Şevê bi piştî Nuh re bi nivîskarê kurdên Anatolîya Navîn Mehmet Bayrak berdewam kir. Birêz Bayrak bi



Nuh Ateş

girani di axaftina xwe de li ser xebat û karên kovara Bîrnebûnê dawestî û bang kir û xwest ku kurdên Anatolîya Navîn xwedî li kovara xwe derkevin.

Zavayê xelika Mehmet Kaya yê ku bi aslê xwe ji kurdên Mûşê ye, bi

stranên xwe şeva Xelika dewlemend kir û xort û keç rakirin govendê.

Piştî govendê di sînevizyonê da çend wêneyên kevn û nû ji Xelika hatin temaşe kirin. Ji bo ku di van wêneyan de pir kesan ku çuyina rahmetê ji hebûn, car caran kesan ku van temaşa dikirin hes girtin û kalegiri bûn. Dema ku bi sînevizyonê re temaşevan bi xeyalê xwe heta gundê Xelika çuyibûn, reîse Xelika birêz Mehmet Yüzer dest bi xaftina xwe kir. Reîs Yüzer bi giranî li ser rewşa kar û xebatên Beledîya Xelikan dastî û got ku: " Ji bo parastina civat û çanda Xelika gerek herkes li problemên Xelikan xwedî derkeve û piştgirîyê bide beledîyê".

Şeva Xelika bi axaftina berpirsiyarê kamela KOMFON Ahmet Sici-



Dîmenek ji şevê...



Mehmet Bayrak

ci re berdewamkir. Birêz Ahmet jî li ser kar û xabatên komelê dasti, banga piştgiyeye dewlemend bi komalê re kir.

Di dawiya şevê de hunermendê delal û Azîz Şêxo hate ser sahnê. Şêxo bi dengê xwe yê gurr û bilind stranên xwe pêşkêş kirin.

Piştî Şêxo berpirsiyarên herdu komaleyên ku şev amade kirin, ji bo kesên ku piştgirî kirine û hatine şevê spasiya xwe pêşkêş kirin û heta careke din xatirê xwe ji mevanan xwastin. Bername bi govendeka çoş û qeş çuûdawi. Her çiqas ji aliyê teknîkî da kemasî hebûn jî, şeva Xalika rengîn derbas bû û bi ser ket.

Wek te zanîn, ji ber astengiyên aborî bi hezaran kes ji welatên xwe derketine derveyî welat. Dîroka hatina karkerên

biyanî li Ewropayê ji sala 1960 de destpêdike. Di nav van karkerên biyanî de karkerên ji Xelika-Qerejdedex ya ji civata kurdên Anatoliya Navin jî hebûn. Sal bi salan xelikî ji gundê xwe derketin, çûn metropolên tirka an ji çûn Ewrûpayê. Di serî de ew kesên ku hatine Ewropayê dixastin, di demeke kin da pere qezenc bikin û bi şûn da vergerin gundê xwe. Ji ber ku rewşa aborî û siyasî ya li welat herdem paşva çûye û xerep bûye, pir kes bi dilsarî li Ewropayê man û li vir bi cih bûn.

Ji ber dûrketina ji gundê xwe, ji



Reîse Xelika birêz Mehmet Yüzer



Azîz Şêxo

çand û civata xwe, dilsarî û durketin di navbara xelikîyên li Xelika û li Ewropa dest pê kiriye. Lê gora rewşa ku ew tê da, pir ji van kesan têkîliya xwe bi Xelika ra sist dikirin, ji gundê xwe dur dikavine û eslê xwe ji bîr dikine an jibîr kirine.

Ji ber wê yekê, di navbara xelikiyan da lêgerîna çareseriya vê pirse jî dest pê kir.

Ji bo ku xelikî li nasname, çand û civata xwe xwedî derkeve, li Ewropayê du komalên Xelika hatin demazrandin. Di serî de li bajarê Witten û pişt re

li bajarê Den Haagê komelên bi navê KARAWITT (Komale Dostaniye Karacadağ -Witten) û KOMFON(Weqfa



Serokê Komela KARA-WITT,
Tahsin Demirsoy



Mehmet Kaya

Alîkariya bo Xelika) hatin avakirin. Armancên van komalan ev in:

- Kesên ji Xelika-Qerejdexê ku li Ewru-payê dijîn bînin ba hew û yekitiya wan çê bikin,

- Ji bo ku zarokên xwe bi Xelika-Qe-re-jdexê re zede werin girêdayinê û cihiyê daûbapîrên xwe bi wana re bidin naskirin, ji sale carekê civîneka mezin û giştî amade bikin

- Bi kesên ku li Xelika-Qerejdex dijîn û ji aliyê aborî (maddî) da pir zehmetî dikşinin re alîkariya maddî bikin,

- Bo parastina nasname û civata xwe, çand û zimanê xwe yê kurdî li Xelika-Qerejdex bi projeyên taybet ve rengîn çêbike û pêş da bibe.

Hasan Yüzer

Gulan 2005 / Witten



Gulê û Serya

Bi dengên yên xweş reng dan şevê

Şeva şênawîyê Kurdên Anatoliyê li Stockholmê

H. Bilikî



Dîmenek ji şevê...

Dema ku min di komîta hazirkirina şeva Kurdên Anatolîya Navîn da cîh girt ez pir bi heyecan bûm. Me xwest şeveka şênawîyê ya xweş organize bikin. Wexta ku şev qadîya, mêvanên me hatin ez û hevalên min pîroz kirin wê demê min zanî ku şeva me rind derbas bûye. Wê şevê biçûkiya min anî bîra min.

Bi qasî ku niha tê bîra min, babîra min hekatek ji min ra digot; Axayek hawûye, wî axayî sê keçikên xwe hebûne. Sal tên sal derbas dibin keçên xwe mezin dibin û xwazgincîyên wan tên.

Axe bana kêçên xwe dike û ji wana re dibê berî hun bizewicin, ez di-xwazim bizanim hûn ji min çiqas hez



Di şevê de gelek caran govend geş dibû

dikine. Keça mezin dibê; ez ji te bi qasî erd û ezman hez dikim. Keça diduya diwê ez ji te pir û pir wiqasî tiştî ku xwaş li ser dunê heye hez di-

kim. Dor tê keça biçûk; herdû xwangê wê ku çi xwaş hebûn gotin wê jî bi bavê xwe ra got ez ji te mîna xwê ya şivê hez



Keçê ciwan bi dayikên xwe re govendê digirin



Mêvanên şevê, ji milê rastê Fikret Güler, Bekir Suwakci, Mehdî Zana, Dr Suleyman bi malbatên xwe ve...

dikim. Bav bi vê cewabê şa nabe, lê na-
de xay kirin.

Wext derbas dibe, keçên êxe dize-
wicin û terin malên mêrên xwe. Wext

tê bav tere zîyareta kaçên xwe. Her sê
keçên êxe çi xwarinên xweş hene didin
ber bavê xwe. Bav ji xwarina keça biçûk
hin pir hez dike û jê dipirse; keça min



Mêvanên li şevê...



Koma gûndê Omê; Yaşar û Serdar û ji koma Sazbend , Mehmet Yalınkılıç

sira xweşbuna şîvên te çî ye? Keçik di-
bê; min tenek xwê zêde avite nav şîva.



Min çima ev çêroka got? Rindiya
şevê êw bû ku herkesê ku hatibû; çî
kurik, xort, mezin, kal û pîr xwe wek
xwediyê şevê didîtin û çî ji destên wa-
na dihat dikirin ku şev rind here, her
yekî li gor xwe dixwest tozek xwê ya
xwe jî di nav de be!...

Em kurdên Anatolîyê, sebebên wê
çî dibin bila bibin, bi sedan sal in, ji
welatên bav û kalan (welatê jêrîn) der-
ketine. Wexta ku merî li xarita Ana-
tolîyê mêze dike, Gola xwê (tuz go-
lu) bala insanen dikşîne. Li nav Ana-
tolîyê, li derûdora gola xwê, heta jê bi
kilometreyê dûrtir, mîna hebên tiz-

Şahan Atcı û Evîndar Atmaca



Nurettin Çiçek, Gürsel Qemerî û Cengîz Acar,

biyeka 99an gund bi gund li dû hev rêz bûne. Herçiqas di navbera wan de gundên tetera û yê tirk hebin jî, wan bi sedan salan edetên xwe rabûn û rû-

niştina xwe zimanê xwe, heta salên 1960î karibûne biparêzin. Ji wan salana bi şun da piraniya wana ji ber sebebên ekonomîkî û siyasî berê xwe dane



Koma Sazbend; Melîh Özsoy, Hasan Cengiz û Mehmet Yalınkılıç

heraliyê dunê, bi piranî welatên Ewropayê bi cih bûne.

Li welatên nû jî heta ku ji destê wan hatiye edet û rusimên xwe xwestine biparêzin û xwe bi însanên wan welatan re bidin naskirin û heskirin. Ji bo vê jî di organizasyonên civakî û çandî yên wek Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn û kovara Bîrnebûne de hatine ba hev.

Ji bo ku bala însanên xwe bikşînin ser xebatên çandî û civakî me xwest em hinek însana jî bo karên wan teqdir bikin.

Wek nimûne Altun Başaran ku jiyana xwe ya bi êş û keder xistibû ser kaxizê û wek kitêb hat belav kirin, de ne tenê jiyana xwe herwiha jiyana jina kurd jî dabû nasandin. Ji bo vê teqdir-



Altun ji destê Nuh Ateş xelata xwe digire.



Dema Kadir Çelik û Ayşe Güler ji bo Goçberên sedsalan xelat werdigirin



Dema xelata Şahan Atcı ji aliyê birêz Dr Suleyman Köksal ve tê dayîn

kirina xebata wê, di şevê de xelata wê mezin jiyana kurdên Anatoliyê, gund
bi destê Nuh Ateş hat dayin. bi gund cara yekem bi navê programa

Kadir Çelik û Ayşe Güler ku bi îm- Goçberên sedsalan anîn ser ekrana tele-
kanên pir hindik û bi fedekariyeka pir



Rohat Alakom dema xelata xwe ji destê Mem Xelîkan wergidire



Ali Ciftci û Mahmud Lewendî

visyonê, xelata wan di şevê de ji aliyê birêz Yusuf Güler ve hat dayin.

Şahan Atci ku bi xwe wek xortekî kurd di civata Swêdê ya komedî de bi henekên xwe li ber televizyonê milyonan dide kenandin, bi hunera xwe ya serkeftî di xurtbûna kesayetiya ciwanên kurd de buye quweteka mezin ku ew pê serbilind in. Xelata Şahan ji aliyê birêz Dr Suleyman Köksal ve hat dayîn.

Rohat Alakom, yek ji wan lêkolînerên kurd e ku ji kurdên kafkasyayê bigirê heta kurdên Anatoliyê, lêkolînên dîrokî û civakî yên balkêş kirine. Herwiha di kovara Bîrnebûnê de li ser kurdên Anatoliyê lêkolînên hêja yên dîrokî nivîsîne.

Rohat bi navê *Şarktan Her Zaman Güneş Doğmaz-Orta Anadolu Kürtleri* kitêbeka hêja dîroka me dewlemend kiriye. Xalata Rohat Alakom jî ji aliyê mêvanê şevê ku xususî ji bo şevê ji welêt hatibû, birêz Mem Xelîkan ve hat dayîn.

Derveyî xelatdayîne di şevê de kesên ku bi salan e emega xwe gi-hêştiye kovara Bîrnebûnê û zimanê kurdî, mîna Ekrem Altun, Mahmud Lewendî, Hesenê Metê, Mûrad Ciwan, Rohat Alakom, Amed Tigrîs, ji derveyî Swêd, Yusuf Polat, Hatice Polat, Nuh Ateş, Muzaffer Özgür, Vahit Duran, Nebî Kesen, Irfan Baysal, Nursen Kaya, Necip Pehlivanoglu, Kemal Güler ji aliyê berbirsê kovarê Ali Ciftci



Yusuf Polat û Rohat Alakom, du hevalên hev ên kevn! Piştî demeka dûr û dirêj di şevê de hev dîtin.

ve navên wan hatin xwendin spasiya wan hat kirin û ji destê Zêrîn Baran û Dilem Gülerê ve gul hatin dayîn.

Kesên ku bi karê xwe yên cihê cihê wek tenik xwêya nav şivê tam dane şevê;

Di wexteka pir kin da **Koma Sazbend;** Melih Özsoy, Mehmet Yalınkılıç û Hasan Cengiz.

Koma gûndê Omê; Yaşar û Serdar Gursel Qemari û Azad

Nurettin Çiçek, ku bi deng û awaza xwe xweş reng dan şevê.

Cengiz Acar, ku çend roj berê şevê biraziyê xwe, Adem(17salî) wenda kiribû disan jî seba xatirê şevê rabû hat û şîna xwe bi me ra parkir û mêvanên

şevê jî tev li şîna kekê wî Îzzet bûn û jî demek kurt be jî em birin welêt!..

Xwadîyê restauranga Mozaik, Paşa hevalên wî; Hedî, Bakî û personalên wan.

Dara Dastan ku videoya şevê kişand.

Spasiyeka taybetî ji bo Gurbet Uzunel, Xezal Güler, Sevîm Güven, Altun Başaran, Hayrettin Güven, Alan Coşar, Nesrîn Altuntaş, Zêrîn Baran, Dilem Güler, Evîn Çiftçi, Rabia Doğan, Botan Coşar, ku di şevê da kar kirine.

Mem Xelîkan û Kadir Celik ku careka din em birin welatê jêrîn û bi helbestên xwe ruhê kal û pîrên me şad kirin.

Ayşe Güler û Evîndar Atmaca ku bi awakî giştî spikerîya şevê kirin.

Hezar carî mala we ava be, hun her hebin!

HÊJAYIYA XEBATA KURDÊN ANATOLIYÊ

Cara pêşî, sala 1974an min peyva Kurdên Anatoliyê li Swêdê nas kir. Hejmareka berbiçav a kurdên Anatoliyê di salên 1960-1970yî de wek "karkerên mêvan" hatibûn Swêdê û heta îro jî bi têkilî û pêwendiyên xwe hebûna xwe wek girûbeka kurd diparêzin.

Di nav van 32 salan de ku ez li Swêdê dijîm min bi sedan ji wan kurdan nas kir. Îro jî hevaltî û dostaniyên me yên germ dewam dikin.

Weqfa Kurdên Anatoliya Navîn hersal li bajarê Stockholmê şeveke şahîyê li dar dixin. Îsal ji şeva wan hebû. Ez jî wek mêvan li şahiyê bûm. Endamên redaksiyona Bîrnebûnê jî çend welatên Ewrûpî, zarok, ciwan, jin, mêr, salmezî, hunermendên ji wê deverê û ne jî wê deverê kesên ku bi kedên xwe yên giranbiha alîkariya kovarê kirine, nunerên rêxistinên kurd, mêvanên wekî din, hemû li wir bûn. Bêşdariyeke rengîn a piralî...

Zarok û newiyên kurdên ji Kurdistanê ku bi destê dagîrkeran berî 200-300 salan ji Kurdistanê hatibûn nefî kirin, serpereştiya şevê dikirin.

Bav û bapîrên wan ji ber ku serî li hember zordestiyê rakiribûn, doza maf û welêt kiribûn, diviyabû jî aliyê hêzên dijmin bihatana cezakirin. Koçberiya sedsalan, plana paqijkirinê dest pê kiribû; yan li rêya sirgûniyê bên telef kirin yan jî ku gihastin navîna Anatoliyê, li wir hêdî hêdî werin helandinê.

Kurdên ji Kurdistanê di nav çend salan de, li ser fermana Osmanîyan/tirkan bûn kurdên Anatoliyê. Jiyane dewam kir, sal û sedsal derbas bûn, nifş hatin û çûn. Lê kurdên asîl wek xwe man. Planên dagîrkeran pûç derketibû. Hovîtiya wan bûbû belaya serê wan. Kurdên sirgûn di nav çend salan de bûbûn xwediyê malê. Bi mal, erd û jiyana xwe ya kurdewarî li wê heremê ciwar bûbûn. Tirkên ku dihat hêvî kirin ku kurdan asîmîle bikin, hin ji wan bi xwe asîmîle bûn dest bi axaftina kurdî kirin.

Belê, zarok û newiyên wan kurdan li bajarekî Îskandinawiyayê, li welatê Vikingan, li Swêdê, şevahengek li dar xistibûn.

Xwezî dagîrkeran vê ahangê bi çavên xwe bidîtana!

Bidîtana ku kurd wek netewe xwedî çî hêjayiyê ne. Bidîtana û guhdariya Şhan bikirana ku digot; "Rast e ez li Swêdê hatim dinyayê û li vir mezin bûm. Lê tu car, kurdbûna min ji bîra min neçû, ez wek kurd ji dayik bûm û ez ê wek kurd jî bimirim. Ez bi kurdbûna xwe û li wir beşdariya xwe ve serbilind im". Şhan Atci, neviyê kurdên Anatoliyê, hunermendê binavûdeng (standup komiker) ev peyv dikirin.

Berpirsiyarên Weqfa Anatoliyê li Swêdê ku heta îro serpereştiya xebata hêja ya kovara Bîrnebûnê meşandine dixwestin bi vê şevahengê hin mesajan jî bidin kurdên Swêdê. Xelat belav kirin. Kesên redaktor, alîkar, xebatker, dilsoz ku alîkariya xebatên wan kirine û beşdariya çalakîyan bûne, sipasî û teqdîrname dan wan.

Piştî her axaftinên li pey xelatan hestên min î netewî bêtir geş dibûn. Bi muzîk û ahenga şevê, awazên curbucur ên hunermendan, bi hevaltî û dostaniya ku di seranserê şevê de xwe vekirî diyar dikir, hêjahiya xebata Weqfa Kurdên Anatoliya Navîn û berhemên wan wek kovara Bîrnebûnê bêtir dihat pêş.

Ked û xebata wan vala neçûbû, piştî 200-300 salan jî be, wek şeqamek netewî li rûyê dagîrkeran diket.

Di çirûskên çavên Temo, Zerîn, Denîz, Heval û sedên wek wan de mizgîniya rojên azad xwe diyar dikir. Di her rîtmên govendê de ruhên kurdewariya wan ciwanan wek bersîvek tal ji bo dagîrkeran dihat şandin.

Spas ji bo berpirsiyar û xebatkerên Weqfa Kurdên Anatoliya Navîn û redaksiyana Bîrnebûnê.

Xebata we hemûyan hêjayê hezar pesnan e!

Li Netkurd 2/5/2005 belav bibû.

Daweta Stockholmê

Li 30'ê Nisanê, şeva kurdên Anatolîya Navîn li Stockholmê ku bi dest Weqfa Kurdên Anatolîya Navîn û kovara Bîrnebûnê hatî bidarxistin mîna dave-takê wû. Ji bo wê min sernivîsa xwe va nava dayê. Dawet wû. Daweta, kurdên Anatolîya Navîn. Hevalan, ji welêt ez jî dawet kiriwûm.

Ez li Stockholmê peya bûm, siftê ez çûm mala ez lê bi mîvan bim. Dûva, em çûn cihê APECê. APEC bi min wek maleke kurdan hat. Mala çand û kultura kurdan. Ne kurdên Anatolîyê tenê. Ji her perçeyekî Kurdistanê heval dihatin diçûn. APECê bi kar û xizmeta xwe bersiv dida hemû kurdan. Ewiya



Mem Xelîkan û Rohat di şeva Stockholmê de

bi serê xwe kêfxaşiyek bû. Hevalên di komîta amedkirina şevê de cih girtin wek malbeteke ku dol û daweta xwe bike kar dikirin û xwe ji şevê re amede dikirin. Hevalan ji min re gotin: "Tu jî di komîtê da yi û ji amedkirina şevê re kar bikî." Ez bi wê pêşnîyara hevalan kêfxwaş bûm. Lê, vaya ne ji min tenê re, her mîvanekî ji derva da hatî, hevalên li Swêdê jî ew wezîfa didanê. Wana jî, wek berpîrsîyarên weqfê û endamên redaksiyona Bîrnebûnê kar dikirin.

Wê wextê, min zanî heval ne şevêkê, ê dawetekê ji kurdên Anatolîyê re, ji koçberên sedsalan re ku îro jî li Ewrûpê xerîb in amede dikine. Xuya dikir şev a wek dawetekê derbas be. Wer jî bû. Mîvan û malbatên beşdarî şevê bûyîn

heryekî wek xwedîyê malê hereket dikirin. Hunermendên Anatolîyê jî bi stranên xwe ew kêfxwaş kirin. Wana jî mîna ku dol û daweta wana be çî ji dest wan hatibû kirin. Beşdarên şevê bi mêr û jina, bi keç û xortan ve kêfxwaşîya xwe bi govend gerandin û bi her awakî din nîşan didan. Li her masekê, yarenî û henek hewûn. Ew jî, şabûn û kêfxwaşiyek din wû.

Nizanim çî bêjim? Çiqas pesnê şevê bikim têrî min nake. Hevalên amedkar bi gulên dayîn mîvana, bi xelatên hatin belavkirin, bi programa şevê, şayî û kêfxwaşiyek bi beşdaran jîyandin, berpîrsîyarên şevê perçema xwe birîn. We mala kurdan ava kir. Mala we jî ava be.



Beşek ji govendgêrên şevê

Celal Talebanî kî ye?



Celal Talebanî di destpêka salên pêşmergayetiyê de

Celal Talebanî havîna sala 1933yê li gundê Kelekan ê li quntara çiyayê Kosret ku li gola Dokanê dinêre hat dinyayê. Ji malbateka dînî ye. Çend salên jiyana xwe li wî gundî derbas kir, piştî ku bavê wî bû murşîdê tek-yaya Talebanî li Koyê, li wir Celal Talebanî çû mekteba destpêkê.

Piştî damezirandina PDK di 16ê agustosa 1946ê de di çarçeweya rêxistinên partiyê de ket nav xebata xwendekaran. Wê demê PDKê rojnameyeka dizî a bi navê Rizgarî derdixist. Nivîseka Celal Talebanî yê genc di wê rojnameyê de belav bû. Di payiza wê salê de tevî xebata ji bo rojnameya El Ahalî

bû ku ji alî Hizba Nîştimanî ya Demokrat a bi serokatiya Kamîl Çadircî dihat derxistin. Celal Talebanî ji xwendinê gelek hez dikir, yek ji wan kesan bû ku bi mebesta xwendina kitêban diçû Kitêbxaneyê Hacî Qadirê Koyî şairê milî yê kurd ê binavûdeng. Sala 1947ê bû endamê PDKê û di partiyê de ew karên ku jê hatin xwestin di wan de aktîf cîh girt.

Sala 1948ê xwendina destpêkê xelas kir û li Koyê çû dibistana navîn. Wê salê hîlbijartinên xwendekaran çêbûn. Celal Talebanî li Koyê wek nûnerê xwendekaran hat hîlbijarin û di kongreya xwendekarên îraqî de bû beşdar ku di nîsana 1948ê de li Bex-

dayê li meydana El Siba' hat bestin. Sala 1949ê ku demeka zordestî û terora hukumeta Bexdayê bû Celal Talebanî bû endamê komîteya nevçeya Koyê.

Sala 1951ê di Kongreya 2.ê a PDK de wek endamê komîta merkezî hat hîlbijartin. Lê belê wî ev ciyê xwe ji endamekî partiyê re hişt ku piştî derketina ji zîndanê beşdarî kongreyê bûbû. Havîna sala 1951ê ew û hin endamên din ên Partiya Demokrat a Kurdistanê hatin girtin û sirgûnkirin ji bo Mûsilê. Li wir jî xebata xwe ya sîyasî berdewam kir, piştî ku serbest bû çû Kerkûkê da xwendina xwe temam bike, komîteyên partiyê li wê derê jî dey-



Celal Talebanî li serê Çîya pêşmerge ye. Yê serê çepê Nûşîrwan Mistefa ye.



Celal Talebanî li gel Mahmûd Osman û Senar, li ser zinarekî rûniştiye

ne û bibe berpirsiyarê wan. Her di wê salê de berpirsiyarîya çapkirin û belavkirina belavokên dizî ên partiyê girt ser milê xwe û ev kar heta ku hat girtin meşand.

Sala 1952yê dest bi Fakulteya Hiqûqê a li Bexdayê kir. Li wê derê jî bi avakirina rêxistinên partiyê biliya. Li wir di nava kurdên feylî de kar kir û gelek ji wan anîn nav refên partiyê.

Di kanûna duduyê ya sala 1953yê de beşdarî li Kongreya 3. a PDK kir û bû endamê komîteya merkezî. Di sibata 1953yê de jî serpereştiya bestî-

na Kongreya 1. a Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê kir. Di kongreyê de wek sekreterê giştî yê Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê hat hilbijartin. Wî broşûrek bi navê Zerûreta Çêbûna Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê weşand. Di eynî salê de ew bû yek ji wan damezrînerên Gencên Demokrat ên Kurdistanê û di salên 1953-1955an de bû sekreterê giştî ê Gencan. Sala 1955ê ji bo beşdarbûna di Festîvala Genc û Xwendekarên Cîhanê ji Îraqê derket û serdana Yekîtiya Sovyetan, Çîn û welatên Ewropaya Rojhilat kir.

Sala 1954 bû endamê buroya siyasî a PDKê. Sala 1956ê xwe ji ber çavan da alî mijûlê xebata bi dizî bû, mecbûr ma ku di sinifa 4ê a hiqûqê de dev ji xwendinê berde.

Sala 1957ê çû Sûriyê û ji wir jî Moskoyê û beşdarî di Festîvala Genc û Xwendekarên Cîhanê de kir. Li Sûriyê wî hin kesên eskerî yên pêşverû yên wek Kemaleddîn Rifet nas kir ku wan soza alîkariya şoreşa Kurdistanê û vekirina radyoyeka bi zimanê kurdî li Qahîreyê (li Misrê) danê. Pişt re wê salê veşeriyê Îraqê û beşdarî di karûbarê buroya siyasî ya Partiya Demokrat a Yekbûyî ya Kurdistanê de kir, bû berpîrsê rojnameya *Nîdal el Kurdistan* a ku bi dizî li Silêmaniyê dihat derxistin.

Di roja yekê a serkeftina şoreşa 14ê temûzê de rêberiya amadekirina

mitîngekê li Silêmaniyê kir. Pişt re çû Bexdayê û li wir beşdarî di karûbarê mekteba sîyasî de û di derxistina rojnameya *Rizgarî* de kir.

Sala 1959ê ji nuh ve wek endamê buroya sîyasî ya partiyê hat hilbijartin. Her çendî di ordiya Îraqê a tugaya 4ê a tankan de efserê(zabit) yedek bû jî berdewam kir beşdarî derxistina rojnameya partiyê a bi navê *Xebat* bû. Rojname bi zimanê erebî derdiket. Di partiyê de jî berpîrsê liqê eskerî bû.

Sala 1960ê endamê mekteba sîyasî û berpîrsê liqê Silêmaniyê bû. Li wê derê kursên têgihîştinê ji bo kadroyên partiyê amade kir ku di wan kursan de bi dehan kadroyên partiyê gîhan.

Sala 1961ê bû sernivîskarê rojnameya *Kurdistan*, piştî girtina rojnameya *Xebat* li Bexdayê tûşî dijwariyan hat. Gava têkiliyên nexweş ên PDK bi



Celal Talebanî li gel hin kurdên Tirkîyê, ji alî çepê ê duduyê Îbrahîm Güçlü ye.

serokatiya ereb a di rêberiya General Qasim de serî hilda û Qasim gelek buhtan li Mustafa Barzanî kirin wî di Newroza 1961ê de gotarek pêşkêş kir ku rexneyeka tûj li rejima dîktatorî dikir. Li ser vê, biryara girtina wî derket, ew bi dizî ji Bexdayê çû Silêmaniyê, li wir beşdariya amadekirina grevêka giştî kir.

Di Eylula sala 1961ê de gava şoreşê serî hilda Celal Talebanî berpîrsê wîlayeta Silêmaniyê bû. Di amadebûna birêxistina hêzên pêşmerge de rolê aktîf girt. Ew bû berpîrsê Hêzên Pêşmerge yê Kurdistanê.

Di Newroza 1962ê de rêberiya êrişê pêşmerge a ser Şarbajêr kir, gelek



Celal Talebanî li Misrê li gel serokê komarê CemalAbdulnasir.



Celal Talebanî li gel serokê Komara Tirkîyê Turgut Özal.

herê m ketin bin kontrola pêşmergeyan û hêz ber bi qezaya Pêncwînê de fireh bûn, hemû navçe rizgar kirin. Bi vî awayî her du navçeyên Şarbajêr û Pêncwîn hatin rizgar kirin bûn bi du bingehên şoreşê di navbera salên 1962-1963yan de. Gelek herêmên din jî di vê demê de hatin azad kirin.

Sala 1963yê piştî darbeya reş a sibatê, bû serokê heyeta guftûgoyan a li gel hukumeta merkezî ya nuh ku wê gavê terefdarê guftûgoyan bu li gel kurdan. Wê gavê heyeta kurdan bi serokatiya Celal Talebanî li Misrê seredana Cemal Abdulnasir û li Cezayîrê a Binbela kiribû wan jî soz

dabûn ku pişgiriya meseleya rewa a gelê kurd bikin.

Her wê salê wek temsîlcîyê Şoreşa Kurd serlêdana Ewropayê kir, li Fransa, Almanya, Çekoslovakya, Rûsya û Avusturyayê xwest şoreşa kurd bide nasîn, piştgiriya jê re peyda bike.

Di sala 1964ê de vegeriya Kurdistanê ser berpirsiyarîya xwe ya berê a li ser hêzên pêşmergeyan. Sala 1967ê beşdarî konferansa partiyên sosyalîst ên ereb kir, ku li Cezayîrê hat girêdan, li wê derê hin bahsên li ser kurdan, yekîtiya ereban û pirsên sosyalîzmê pêşkêşî beşdaran kir.

Sala 1970ê roleka karêger di yekkirina her du baskên KDP de lîst ku berê ji ber nakokîyan bûbû du beş.

Sala 1972yê li Misir û Lubnanê temsîla Şoreşa Kurdistanê kir. Di sala 1975ê de di encama Peymana Cezayîr a adara 1975ê ku di navbera Îran û Îraqê de pêk hat, şoreş rawestiya.

Celal Talebanî li gel hevalên xwe yê ji komele û rêxistinên cuda di 1ê Hezîrana 1975ê de li Şamê Yekîtiya Nîştimanî Ya Kurdistanê damzirand. Yekîtiyê çek hilda û ew jî bû Sekreterê Giştî ê wê.

Celal Talebanî sîyasetmedarek bû ku li qada Rojhilata Navîn pêwendiyên wî yê piralî bi hêzên pêşverû yê Îraqê, yê ereb û bi taybetî yê filistinî re hebû.

YNK bû endama Enternasyonala Sosyalîst, wî di vê riyê re û di gelek riyên din re têkliyên xwe yê dîplomasiyê li gel gelek serok û sîyasetmedarên Awropayê xurt kirin.

Bi hêzên sîyasî yê perçên din ên Kurdistanê re hevkarîyeka demadem a baş da peydakirin.

Yek ji nivîskarên berdewamî ên rojnameyên *Xebat* (1959-1961) û *El Nûr* (1969-1970) bû ku herdu jî li Bexdayê derdiketin. Pîraniya nivîsên *Şerare* ku YNK derdixist ên Celal Talebanî bûn. Wî bi nivîs û gotarên xwe rojnameya *El Ittîhad* (organa merkezi a YNK) dewlemend kiriye. Wî berdewamî jî rojnameya *Kurdistanî Nwê* re nivîsiye.



Celal Talebanî li gel heyeteka Îraqî li ba George W. Bush serokê Amerîkayê



Celal Talebanî û Kofi Annan serokê Neteweyên Yekbûyî (NY)

Ji ber vê xebata wî ya rojnamevanîyê ew sala 1959 ê wek endamê Komiteya Sendîkaya Rojnamevanên Îraqê hat hilbijartin.

Wî hin kitêbên lêkolînî yên dîrokî, siyasî û civakî bi kurdî û erebî jî nivîsîne ku kitêbxaneya kurdan û ereban dewlemend dikin.

Şerê Kuveytê û serîhildana kurdan, pişt re jî êrîşa Sedam a li ser Helebçeyê û li ser herêmên din ên Kurdis-

tanê bûn sedemên avakirina herêma Kurdistanê ya ji bal NY parastî. Li Kurdistanê carinan îdareyek, carinan jî du îdare hatin danîn, hilbijarîtnên herêma Kurdistanê pêk hatin. Hêz û rêxistinên navneteweyî yên resmî û sivîl hatin Kurdistanê. YNK û PDK bûn hêzên serekî yên îdareya Kurdistanê. Celal Talebanî û Mesûd Barzanî bûn du serokên esasî ku di îdarekirina Kurdistanê de û di avakirina wê de berpirsiyariyeka bingehîn dan ser

milên xwe. Her du hêz carinan ne li hev bûn hev du êşandin, carinan jî li hev hatin bûn yek bi hev re Kurdistan îdare kirin. Ji 1992ya heta roja hîlbijartina wek serokomarê Îraqê Celal Talebanî yek ji wan her du serokan e ku li hundurê welêt û di warê navneteweyî de karûbarê kurdan meşand. Bi vê mebestê wî gelek paytext û metropolên rojava û rojhilat ziyaret kirin û serokên siyasî yên welatan û yên rêxistinên navneteweyî dîtîn.

Di 15-4-1992 de ew çû Tehranê û li gel wezîrê derva ê Îranê Welayetî, di 21 4 1992ê de li gel serokomarê Îranê Haşîmî Refsencanî rûnişt.

Di 10 6 1992 de çû Ankarayê li gel serokwezîrê Tirkîyê Silêman Demirel rûnişt. Di salên navbera 1990 û 2005ê de heta hîlbijartina serokomariyê Celal Talebanî gelek caran bi serê xwe, bi heyetên partiya xwe re yan jî ew û Mesûd Barzanî hatin Tirkîyê. Wî Turgut Özal û Süleyman Demirel wek serokkomar, Süleyman Demirel, Tansu Çiller, Mesut Yılmaz, Bülent Ecevit, Recep Tayyip Erdoğan wek serokwezîr ziyaret kirine.

Wî welatên ereb ên wek Misir, Saudi, Kuveyt, Suriye Lubnan û Urdin ziyaret kirine, li wan deran Kral Husayînê Urdunê, Kralê Urdunê û serok devletê Misrê dîtine.



Dannielle Mitterand xanima Françoise Mitterand seroka Weqfa Azadî a Fransayê û Celal Talebanî

Di demên cuda de bi sekreterên giştî yê NY Butros Butros Galî û Koffi Annan re civîn kirine.

Li Parîsê li gel Serokê Fransayê Fransuva Mitterand Jacques Chirac, Toni Blair; serokwezîrê Îngilterê rûniştiye.

Gelek caran serokên Sûriyê, kralê Kuveytê û serokên welatên ereb ên din ziyaret kiriye pîrsa kurdan û a Îraqê ragihandiyê wan.

Di mesela avakirina Îraqeka nuh a federal de YNK û PDK di serokatiya Celal Talebanî û Mesûd Barzanî de hevkarî û yekîtiyeka pîralî di navbera xwe de û li gel rêxistin û partiyên cuda yên Kurdistanê avakirine, siyaseteka mişterek dajon. Di têkoşîna hukumeteka yekbûyî a Kurdistanê de tevêkirina Kerkûkê û deverên mayî bi ser herêma Kurdistanê de, di pîrsa Îraqeka Federal û danîna destûra Îraqê de ew bi hev re ne, xwedan siyaseteka bi hevbeş in. Di hilbijartinên derbasbûyî yên Îraqê de listeya yekbûyî ya Kurdistanî serkeftin-eka mezin bi dest xist, 75 parlamenter



Celal Talebanî û serokwezîrê Tirkîyeyê Tayyip Erdogan

xistin parlamentoya merkezî a Îraqê. Hilbijartineka nû li Kurdistanê bû, dewreya dudu-yan a parlamentoya Kurdistanê destpê dike, hukumeteka yekbûyî tê danîn.

Celal Talebanî yê Serokkomarê Îraqa Federal yek ji wan her di kesan e ku rêberiya vê qonaxa serkeftî ya kurdan kir, bu esasek ji bo avakirina vê rewşa kurdan a ku perspektîf û hêvîyên nuh li ber kurdan vedike û meriv pê serbilind dike.

Hiqûqa Ewropayê û pirsgirêka kêmetewan

(I)

1. Destpêk

Li Tirkîyê nîqaşek li ser pirsgirêka kêmeteweyan (mînorîtî, hindikahî) berde-wam dike. Ev nîqaş, ji aliyekê de bi raporên Yekîtîya Ewropayê (YE) û pêvajoya endametîya Tirkîyeyê ket rojevê, ji aliyê din jî, sîyasetmedar, nivîskar û lekolînerên tirk li ser statuya kêmeteweyên ku ji 82 salan vir da hemwelatîyên Tirkîyê ne û mafên wan ne li gora Peymana Lozanê be jî li gora standardên hiqûqa nawnetewî heta îro cih girtine, disekinin û li "alternatîfan" digerin. Çiçes navê kurdan neyê gotin jî, bi rastî, ev babet bi pirsra kurd va giredayî ye û tesîreka mezin li ser kurdan û statuya wan dike.

Qebûlîkirin û paraztina mafên kêmetewan li Tirkîyê divê di demeka zû da realîze bibe, ji ber ku krîterên Kopenhagê û despêkirina danûstandinên endametîyê ji bo çareserîkirina pirsgirêka kêmetewan, Tirkîyê mecbûr dîkin. Di vir da, Tirkîye ne xwedîyê îtirazan û şertan e. Wezîfeya dewletên berendam yê YE ew e, ku ew sîstema xwe ya sîyasî, aborî û civakî di rîya nêzîkbûnê (entegrasyonê) da bigu-

herin, yan ji nû ve ava bikin. Bingehê wan guhertinên pêwîst tenê hiqûqa Ewropayê ye. Bêşik, hiqûqa kêmetewî û esasên wê di sîstema hiqûqa YE da cih girtîye û di warê danûstandinên endametîya Tirkîyê da dibe faktorekî pêwîst.

Divê kurd mekanizmayên hiqûqa Ewropayê rast bizanin yan jî bibînin û di nîqaşa li ser pirsgirêka kêmetewan da cih bigrin. Ji bo maf û azadîyên kurdan, ku ewan bi nifûs û welatê xwe statûya netewekî mezin li Rojhilata Navîn pêk anîne, qebûl û tetbîqkirina mafên kêmetewî li Tirkîyê gavek giring e. Wek tê zanîn, kurdên Anatoliya Navîn û kurdên li metropolên Tirkîyê grûbek kêmetewî ne. Lewma, hiqûqa kêmetewî ne tenê pirsek Tirkîyê ye, ev li ser îstîqbalê kurdan jî divê tesîrek mezin bike.

2. Sîstema hiqûqa Ewropayê

YE, prosesa nezîkbûna (entegrasyonê) xwe li ser prensîbên hiqûqî ava kir. Wê di dema damezrandinê da bi peyman û biryarên hevkarîyê wek Peymanên

Roma li sala 1957a çarçeveyek huqûqî çêkir û heta îro pêş ve bir. Ji bona vê, hiqûqa Ewropayê êdî bûye beşek ji huqûqa dewletên endam. Tesîra hiqûqa Ewropayê li ser sîyaset, aborî û jiyana civakî ya welatên YE gelek mezin e û di dema pêş de hiqûqa netewî gav bi gav ê bê berdand yan jî bê guhertin. Dewletên endam yê YE jî di navbera hev da li ser bingeheên hiqûqa Ewropayê têkiliyên xwe pêk tînin û pêşve dibin.

2.1 Peywendiyên hiqûqa YE û hiqûqa netewî
Di hundurê dewletên YE da niha sê sitûnên (lingên) sistema huqûqî hatine cih û gerek tev hev bînin. Ev sîstem jî bo her dewleteka endam derbaz dibe û bi kurtî wisa ye:

Sîstema hiqûqa dewletên YE

- Hiqûqa netewî
- Hiqûqa Ewropayê (yekitî, civakî)
- Hiqûqa navnetewî

Hiqûqa Ewropayê û hiqûqa navnetewî li gora prensîba serketî (subsidiarty) û pêşcîdanê (priority) tê pêk anîn û ji bo hiqûq û muhakemeya netewî giredayî ye. Ji avakirina YE vir da mewzûata hiqûqa wê, li pey hev hate firehkirin û li gora armancên yekitîyê tê guherandin. Ev êdî jî bo aborî, sîyaset (ya hindûrî û nawnetewî), ewlekarî, çandî û jiyana civakî ya dewletên endam bi piranî esas e û li rewacê ye. Ji bona vê, divê hikûmet, îdare, muhakemekirin û rêxistinên dewletên Ewropayê pêvajoyên hiqûqa yekitîyê teqîb bikin û di xebatên xwe da bidin berçav.

Çavkaniyên qanûnî yê YEê pir in û cure ne. Mane û liserkarîya wan jî bo dewletên endamên YE giring in û di tetbîqkirinê da divê bînin. Ne mimkun e, ku dewletên endam naveroka hiqûqa Ewropayê li gora xwe şîrove bikin yan jî biguherin.

Dem a ku di nav hiqûqa netewî û ya Ewropayê da nakokî û pevnehatinî derdikeve, wê gavê biryara Dîwana Dadgehê ya Civatên Ewropayê (DDCE, The Court of Justice of European Communities) pêwîst e. Qerarên wê mehkemê jî bo hemû dewletên endam derbaz dibin û nikarin bînin guhertin.

Bi şikl, rêxistin, berpirsiyar û sîyasetvanên YE dîtin û biryarên wê mehkemê jî xwe ra wek qanûn dizanin û îcra dikin. Lê ev nayê wê maneyê, ku dewletên endam biryarên dadgeh û organên YE jî sedî sed daxin nav hiqûqa xwe ya netewî, lê ew mecbûr in esasên hiqûqa YE di qanûnên netewî da bidin berçav.

Wek tê dîtin, mekanîzma hiqûqa Ewropayê, ji aliyê fonksiyon û kontrol, di hundurê yekitî û dewletan da rolek mezin dilîze.

2.2 Çavkaniyên hiqûqa Ewropayê

Awa û naveroka hiqûqa YE di tarîxa dinê da tek e û bê nimûne ye, çima ku dewletên endam li aliyê hiqûqa xwe sîstema hiqûqeka sernetewî bi hev re pêk anîne û daxistine nav hiqûqa xwe ya netewî. Ji bona vê, hiqûqa Ewropayê di rewşa dewletên endam yê YE da ne wek hiqûqa nawnetewî ye,

lê beşek hiqûqa hundur a dewletê ye. Tişteki balkêş ew e ku YE bi dewletan ra û bi rexistinên navnetewî ra bi navê yekitî peymanan, li gora esasên hiqûqa navnetewî qebûl û îmze dike. Ev peymanên navneteweyî ji bo endamên YE bivênevê ne.

YE stratejiya xwe ji aliyê entegrasyona aborî, siyasî û çandî yê dewletên endam li ser sîstema hiqûqê pêkanîye û bi xebat û siyaseteka îstikrarî berdewam dike. Ji bona vê pir çavkanîyên hiqûqê hatine çêkirin û di sê kategorîyan da tên gotin:

Cavkanîyên hiqûqa Ewropayê

1- Mewzuata yekemîn

- Peymanên YE
- Hiqûqa muhakemê

2- Mewzuata duwemîn

- Peymanên navnetewî
- Rêznameyên organên YE
- Talîmat û biryarên organan
- Tewsîye û daxuyanîyên organan
- Biryarên gelemperî û prîvat yê organan

3- Mewzuata siyemîn

- Dewrkirina selahiyetan

- Dewrkirina norman

Mewzuata yekemîn: Peymanên YE li gora hiqûqa gelan ji bo dewletên endam bivênevê ne. Mehkemeyên (dadgehên) YE rola observator li ser sîstema hiqûqa Ewropayê dilîzin û tetbîq kirina peymanên û biryarên yekitîyê kontrol dikin.

Mewzuata duwemîn: Serê mewzuata hiqûqî ya duwemîn ji aliyê peymanên nawnetewî tên. YE, bi navê xwe van peymanan îmze dike. Peyman ji bo YE û endamên wê bivênevê ne û pêşîya cavkanîyên din yê mewzuata duwemîn divê bên pêkanîn. Ji aliyê din di hiqûqa Ewropayê da rêzname, talîmat, biryar, tewsîye û daxuyanîyên rêxistinên (organên) YE cih girtine. Ji ewan tenê tewsîye û daxuyanî ji bo dewletên endam ne bivênevê ne.

Mewzuata siyemîn: YE yek caran îmkân dide rêxistin û dezgehên dewletekê yan jî ewropayî, ku ew biryarên hiqûqî derxin. Ji bona vê mewzuata siyemîn çêbûye û di du waran da realîze dibe. Yek ji wan dewrkirina selahiyetan e. Ya din jî li ser dewrkirina norman wek normên teknîkî ye.

(Berdewam dike)

Roja jina ya bêkuteq

Li Tirkîyê polêz elem û eşkere jinên ku bi minesebeta 8 ê adarê teve meş û kombûnan bûn hêngavtin; ew dana ber kutan. Ku te li dîmenê jin kutanê mêz dikir, teyê bigota, qey 8 ê adarê, li Tirkîyê “roja jin kutanê” ye. Hun ê nûha bibên, ma va tiştêkî nû ye, jin rojên din jî nayên kutkirin? Rast e.

Eynê rojê, ya rашtatineke tesaduf bû yan kirineke qestî bû, berpirsyarên Yekîtiya Ewropa jî li Anqereyê mîvan bûn. Qe na wana xwaztibû ku bi çavên xwe bibînin, ka Tirkîyê krîterê Kopenhagê bi çi awayî bi cîh tînê. Polêz û hêzên li paş wî ên veşartî bi vê kutkirina “milî” û “resmî” dan zanîn ku, ew ne krîterê Kopenhagê, lê yê Anqereyê li gora parolaya, “ji êşkencê ra sifir tolerans” ya hukumeta Erdogan bi cîh tînin. “ji êşkenceyê ra sifir tolerans” meriv dibê, qey jî terefa polêz da şaş, wekî “ji toleransê ra sifir tolerans” hatiye fehmkirin.

Ji bo jina ferqa roja 8 ê adarê ji rojê salê ên din tune, ew tim tîn kutan. Heqê xwe ye, ku meriv pêşniyar bike, ku şûna 8 ê adarê, qet nebe ji salê rojek, ji bo jina wekî, “roja jina ya bêkuteq” bê nîşankirin û pîrozkirin. Qet nebê di vê rojê da, jin neyên kutkirin.

Kî dibê çi ma bibê, jinbûn jîyaneke pir bi meşeqet e; karî jina î pir zor e û qeremî wana î giran e!

Kê bi kê kanîye, mêr li jina jin jî li zaroya dixin. Yanê jin jî gunehkar dibin; ew ne meleyka ne. Hêjmara jinên ku reya xwe didin qerarên kuştinên li ser navê “nemuspakkirinê” yê nec-lisê malbatan ne hendik e. Zordariya li ser jin û zaroyan ji hebixana pirtir di malbatê da pêk tê. Erê, di malbata ku wekî sazîyeke pîroz tê qebûlkin da. Ku tu li zora navmalî dinêrî, tê bibejî, her malekê bûye kutegxana. Meriv xwe bi xwe ra dibê, ecaba ji vê ye, ku herkes dixwaze rokê pêş da, ji xwe ra malbatekê saz bike!

Van rojên rabirtî, li Almanyê bi destê sazîyeke resmî lêpîrsînek li ser deh hezar jina hate kirin. Ew dide xuyakirin, ku li Almanyê jî sedî 40 jin di jîyana xwe ya ji 16 salîyê berbi jor da, hatine kutkirin yan jî zordariya seksî dîtine. Li ba jinên koçber (Tirk û Kurd) hêjmara yê ku van zordariyana dîtine, ji sedî 49 ye. Ango, kutkirina jina li her derê heye, lê li Tirkîyê û li ba Kurd û Tirkan qatekî zêde ye. Yek ji encamên vê lêpîrsînê jî ew e, ku cûreyên zorê li ba Tirk û Kurdên koçber

zêde ye. Ji wana yek jî, zewaca bi zorê (zorzewac) ye. Ji sed jinî koçeber (tirk û kurd) nîvî gotiye, ku ew bi mêrê ji mermalîyê va hatine zewicandin. Kirineke trajêdî jî ew e, ku hen caran, çi keç çi jin, di bin navê “nemûspakkirinê” da, bi destê mêr, bav û bira tên kûjtin. Va rûreşîya pirtir li ba kurdan heye. Fadîme Şahîn (Stokholm), Hatun Sûrûcû (Berlîn) bi vê rê û sewa ku xwaztibûn jîyanake serbest û serbixwe bijîn li metropolên Ewropa hatin kûjtin. Erf û edetên kevn û kultura dînî rê nadin ku jin xwedîyê jîyan û bedena xwe bin. Yên ku wana dikûjin û dikevin bin vê gunehkarîya giran mehkûmê vê kulturê ne.

Ji hen koçebera nayê, ku ew tehemule serbestîya jîyana li Ewropa bikin. Dubendîya navbera jîyana tradîsyonî û modernî mîna gilokeke rîsînî li dest û nigên wan pêçikîye, ew nikanin ji nav derkevin, xwe şaş dikin û trajedîya tînin serê xwe.

Encameke balkêş ya jinkutana li Tirkîyê ew bû ku Serkomarê Tirkîyê A.N. Sezer ji serdana xwe ya Fînlândîyê ferexet kir. Çima? Qe na şewirman û aqildarê wî temenî lê kirin gotin, mere, ku tu çûyî jinê fînî ê te lenet kin. Ku Sezer biçûya, ecaba jinê fînî ê bigotana çi? Herhal ê bigotana, em serdana serdarê “Komara Kutegê” qebûl nakin!

ANSİKLOPEDIYA ZAROKAN

Ansîklopedîya Zarokan

Weşanên Apecê

Hûn dikarin li adresa
jêr bidest bixin

DİPNOT KİTABEVİ


Selanik Caddesi No: 82 / 32

Kızılay ANKARA

Tel: 312 - 419 29 32

Kovara Bîrnebûnê

jî her li vê
adresê peyda dibe



“Kerkûk tirk e!”

“Konîya kurd e!”

“Kerkûk tirk e!” Wer dibên hen tirk. Hen kurd jî, wekî ku bersiva wan bidin, dibên, “Kerkûk kurd e!” Hene din jî, ji ber ku turkman li Kerkûkê hendikanî ne û qasî hêjmara wana kurd li Konîyê hene, dibên, “Konîya jî kurd e!”

Li gor vê mantixê Stambul, Anqere, İzmir jî kurd e. Berlîn û Dîyarbekir jî tirk e!

Hing û şerê navbera etnîya pir cara bi vî awayî destpê dike. De nûha, em ê Kerkûk û Konîyê lê kê mahr bikin yan jî çing parva bikin?

Herçiqaş piranîya nişteciyê Kerkûkê kurd bin û Kerkûk bajarekî Kurdistanî be jî, tu kêriya dubarakirina gotina, “Kerkûk kurd e” tune û bi ser da jî pê vê dilê Kerkûkiyan ên ne kurd tê eşandin. Mahrkirina bajarekî li etnîyekê yan li miletekî di vê wextê da, ne tişteki aqilane ye. Ma gotina Kerkûk ya kerkûkiya ye ne baştir e?

A rind ew e ku, qet nebe navê bajara pir cara bêteref e, yanê bi navê etnîyekê va grênedayî ye. Lê navê welat û dewleta tim ne wengna ye. Kerkûk di nav coxrafya Kurdistanê, Konîya jî di nav coxrafya Tirkîyê da ye. Navê Kurdistanê jî mîna navê Tirkîyê navê etnîyê ye. Lê li her du welatan jî

milet û etnîyê din jî hene. Loma navên dewlet yan welatên etnîyê ne baş in û pir cara ew dibin sedema serêşî û bihevketinan.

Loma rexneya ku kurd li navê Tirkîyê û Tirkîyêyî (Türkiyeli) dikin di cîh da ye. Hen dibên van navana etnîyê ne û cîh nadin etnîyên din ên ne Tirk û pêşniyar dikin ku bên guherîn. Ma navê Kurdistanê jî ne navekî etnîyê ye? Yekî turkman li Kurdistana İraqê encax dikane bibê, “ez Kurdistani me!” Ma Kurdistani (bûn) dibe, lê çima Tirkîyêyî (bûn) nabe? Bi çi heşan meriv ê li dijî binavkirina Tirkîyêyî, qet nebe, ji bo Kurdên Anatolîyê û yên Metropalan derbikeve?

Ku bi ya min be, ez ê navên welatan ên etnîyê biguherim. Ji xwe, navên heyî bê mene ne û bi ser da jî ew dibin sedema derd û tahlîyan. Ma çi mene û fêdeya vê heye, cîhê ku kurd lê pir in, Kurdistan be û cîhê ku Tirk lê pir in, Tirkîye yan jî Turkmenîstan be?

Ez şûna kurdê Kurdistana Başûr bim, îmkân êdî di dest wan da heye û ew xwedîyê hemdeke serbest in, ez ê navê Kurdistanê biguherim û navekî nû û bêteref hêlbijêrim. Di eslê xwe da, wekî navê Tirkîyê, navê Kur-

distanê jî xelkê lêkiriye, ne îcada kurda bi xwe ye.

Qe ne ku nav tunene; navên ahengdar û wekî kênebar pir in. Aha ji we ra, wekî mînak çend pêşniyar: "Jîyanîstan", "Xwaşhalîstan", "Evînya", "Nûjînya", "Hêvînya", "Bratîwar", "Hezderya"..!


De werin, tişte ku em ji xelkê dipên û dixwazin, berê em bixwe bikin!

Nav û navlêkirin li pîyekî bisekinin, heq û huqûqa niştecihê bajarekî, yên kom û kulturê cihê bi cihê li wir, mihumtir e. Ku te ji vî aliyê da lê mêz kir, rewşa turkmanê Kerkûkê û kurdê Konîyê ne mîna hev e. Turkman xêrdîtî, kurd xêrnedîtî ne. Turkman li Kerkûkê xwedîyê heqê kulturî û sîyasî

ne. Partîyê bi navê Turkmana hene; mektew, vîzontele û radyo bi zimanê turkmanî heye û turkman di meclîsa vîlayeta Kerkûkê da tîna temsîlkin. Lê kurdê Konîyê, yên din jî tevê, ji van heqana bêpar in.

Ne gîştik, komikek ji turkmana û dest-brakê wana ên li Tirkîyê vê ferqê nabînin. Ew ê bûne hesûdê kurda, qet tu tiştî rewayî wana nabînin. Statûyeke cihê û serbixwe ji bo Kerkûkê dixwazin. Heta bi vê misebetê qala modela Brukselê tê kirin. Çima modela Brukselê tenê ji bo Kerkûkê û ne ji bo Bexda, Anqere û Konîya jî?

KEJÊ



Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê

28 kitêbên kurdî li welêt
weşandin û tevî

Enstîtuya Kurdî ya Îstanbolê
belaş li zarokan belav dike.

Yek ji wan kitêban jî

Kejê ye.

Kejê çîrokeka gelêrî ya kurdên
Anatoliya Navîn e ji hêla
endamê redaksiyona Bîrnebûnê
Seyfî Dogan
hatiye berhevkin.

Li welêt hûn dikarin ji
Enstîtuya Kurdî ya Stembolê
peyda bikin.

Çîroka li bin baranê

Ev çîroka li jêr, xortekî kurd li kêleka behra Zûrichê ji min re got. Baran şên dibarî, em li ser bankeka darînî rûniştibûn. Mêr û jinên ku di ber me re derbas dibûn, şemsiye li ser xwe girtibûn. Porê me şil dibû û me bi kefa destên xwe dadişand. Min navê wî mêrê kurd ji bîr kir. Ricake wi tenê hebû: got ma gundiyên min ê ku li gund mayîn, xebera xwe ji çîroka me nebin. Min soz da wî.

“... dema ku kalikê min bi nexwaşiya bênav diçe rehmeta Xwedê, bavê min sê salî bûye. Îro dibêjin, ku ew nexweşî dilrawestîna bûye. Piştî ku kesekî ji malbata bavê min nexwastiye diya wî li xwe mar bike, malbata diya bavê min gotiye “keçika me bê parastin nabe” û hatine keçika xwe ya diya zarokekî birine. Girî û kilamên ku wê li ser zarokên xwe û hêja diya bavê min li ser hespê li paş birayê xwe gotibûn, bûn stranên meşhûr. Îro jî tîna qal kirin. Çend rojan bi şun da ew dane mêrikekî ku ji wê qasî bîst salan mezintir. Bavê min Abbas li cem apê xwe yî ku bavê pênc xortan bû maye û çend mehan bi şun da bûye yekî ji malê. Ew jî bi apê xwe û zarokên wî re li ser ereba hespa tere ser bax û bostan, bi wan re rabûye û rûniştiye.

Şeş sal derbas bûne, bavê min neh salî bûye wexta ku tucarê fistiqa ji Taşkoyê li serê sibê hatiye gundê me. Li ser sifrê runiştibûne û mêrik kula dilê xwe ji apê min û jina wî re gotiye: Zarokên wî nebûn û wî nedixwast ku ocaxa xwe vemire. Apê bavê min li jina xwe wegeriyaye û gotiye, pênc lawik bese min in û em Abbasê sêwî bidin wî mêrikî bi wext! Jina wî ji hewa de li benda tiştêkî wusa bûye. Bi girî û qîrînê bavê min li ser motirê mêrik çûne gundê wî. Zarokê apê min li ser wî şûn kirine, lê çi fêde!

Her sala ku mêrik ji bo karê xwe yî sandin û firotinê hatiye gund, wî bavê min jî bi xwe re anîye û her tim kincê nû li wî bûne. Apê bavê min hingê ew bi kincên nû mal bi mal digerandiye, ji wan cîranan re ku ji wî loma dikirin digotiye ku birazîyê wî ketiye maleka mîna cennetê, destekî wî yê di hingiv da ye yek jî di rûn da ye, li gundê tirkî tirkî ji hîn bûye. Apê bavê min bi xwe tirkî li eskeriyê hîn kiribû, hîngê gundiyên me li kesên ku tirkî dizanin bi çavnebarî mese dikirin. Pîreka gundî rabûye xwê li dora bavê min belav kiriye ku ma ji çavan biparêze. Bavê min bûye xortekî bilind û bi nav, lê wexta ku dema wî yê zewacê hatiye

kesî li wî gundî kêçika xwe nedaye wî, ji bo ku ew alewî, gundî ji sunî bûne. Li dawî, ji şerên giran bi şun da, bavê min kêçikekê; diya min direvîne û tê gundê bavê xwe.

Jiyana xweş

Li gundê bavê wî van salan pir mêr çûbûn Ewropayê, erd û gomên gund vala mayîbûn. Ji derên biyanî, pîranî ji gundên tirka li doralî me şivan dihatine gund ku bişuxilin. Bavê min erdê merivên xwe ku koçber bûn diajo û di hundirê çend salan de keriyekî pez û bizin digihîne hev. Ew dibe rênçber û bi rûnê xwe diqewire. Ew bi kêf e, te yê bigota: nivîyê dinê bûye para wî. Di pênc salan de çar kurikê me dibin, du keçik û du lawik. Bavê min ji me re digot : ez li dor dinê çax bûm, lê min rehetiya dilê xwe li gundê bavê xwe dît.

Em şora xwe zêde direj nekin. Êvara rojeka bi ewr eskerên tirk tén gund û bavê min di bin mist û pîna de kaş dikin cîpa xwe. Li kal, pîr û zarokên gund dibe qîrînî. Esker guhdarî kesî nakin, gazê didin cîpa xwe û di nav toz û dûmên de com dibin. Dawîyê çend rojan bavê min tê, ew di halakî de ye, meriv bigota heft cîp di ser wî re derbas bûne. Eskeran jê re gotine xerber ji gund têye ku ew gerilla xwedî dike. Wî ji me re digot: tiştê ku li qaraqolê hatin serê min, ne hûn bipirsin ne ji ez bahs bikim. Lê wî li ser wê meselê tobe kir ku li gund nemîne. Wexta ku ew çû, wî bi xwe bi hezaran histêrk vala kirin, lê em bi kêf bûn û me

digot em ê rojekê herin Ewropayê cem merivên xwe yê bi kincên rind. Pezê me dan qesebêkî simbeldirej û zikgir. Lê li me bi qar hat.

Şofêrê TIRê bavê min û yanzdeh hevalên wî yên din li parqeke nêzîkî bajarê Baselê danîn, ew ji pismamê xwe yi ku bi salan li wir bû re telefon dike. Lê rêdarî ewqes zor bûye, bavê min bêhal maye ku wî û pismam hevdu nas nekirine. Ku me ji çend rojan şun da bîhist ku bavê me li sinorê Swissre nehatiye girtin û derbas bûye, me got wî xwe xelas kir. Çend roj derbas nebûn, me dest ji dibistanê berda û me xwe ji çuyînê re hazir dikir. Piştê mehekê dolmîşa gund ji me re mektûba bavê min anî, di nav de resimê wî ku li ber taxsiyeka zer hatîbû kişandin derket. Me resim dest bi dest, mal bi mal gerand û me bawer dikir ku bavê min bûye xwedîyê taxsiyekê. Apê bavê min î ku êdi nedikarî me bikşîne ber pezê xwe dikir were wir û digot ew taxsiya lawikê wî ye. Hingê hat bîra me jî ku ew rast bû; me pir resimên lawikê wî ku li ber, li kêleka taxsî bi quretî dawestî bû, yan jî li ser qaporta wê rûniştîbû dîtîbûn. Mamoştê me yî ku bi eslê xwe kurd bû dihat mala me û digot ku ew bawer e, em ê li demeke nêzîk nikaribin herin Swisreyê û wî dixwast ku em werin dibistanê. Lê me qirara xwe dayibû, pêxember bihata jî me guh nedida ser wî. Apê bavê min êdi dest pê kir ji Swissre zêf û kufr dikirin. Lê ku jina wî ye dilgerm şor dianî ser perê ku ji vir de bê zeh-

met dihatin, apê bavê min digot, tobe tobe yarabbî li qisûra min nemîne. Ew mêtîkê dilfireh bû yekî hêrsîran. Wî em di qula derzîyê re derbas dikirin, lê me jî dilê wî dişkand û digot em ê herin û ji te xelas bin.

Heviya bêmerc

Ji çûyina bavê min bi şun da çar sala çavên me şev û roj li rêya mektûba ku ji Swissreyê bihata bû. Şofêrê dolmişa gund her roj dihat ber mala me û dipirsî ka em kînge herinê welatê ji cenetê. Wexta ku bavê min saxiya xwe kir ku ew bi rêya dewletê me nikare bibê cêm xwe, me şebekeyek ku bavê min jî birîbû Swissre girt û me da rê. Ji hêrsê xwe re kalîkê me xatir ji me nexwast. Lê em li sînor hatin girtin û çar rojan bi şunda wegerîn gund. Me dîsa bi mehan guhdarî li kaxizên ku ji Swissre bên kir. Rojekê xeberek hat, te yê bigota pêxember hatîye mala me: ji balyoza Swissre li Enqerê mektûbek hatibû û digotin vîza me hazir e. Bavê min haqê mayîne heynaye.

Em bi kêf çûn Swissreyê, ez cara yekem li balafirê niştim. Em difirîn.

Bavê min di ber hatina me, ji me re xanî li gundekî bi navê Boswil girtibû. Wexta ku em ketin mala xwe, me bawer dikir ku em hatinê mala Xudê. Me dest bi dibistanê kir, bavê min got, hûn mecbûr in herin dibistanê, lê zîmanê elmanî bi me mîna gujeguja erxa gundê me dihat.

Min li vir tiştêkî giring bîr kir: ku bavê min çû Swissreyê û me, me-

zin û biçûk, bawer dikir ku ew ê haqê mayîne bistîne, pismamekî wî jî xwast ku ew du lawikên wî ji heyne ser xwe ku lawikên wî bibin "birayên" me, bibin îşçiyê welatê dewlemend. Wî digot ma lawik herin xwe xelas kin. Bavê min î rûnêrm nikarî bê "na", diya min çû daira nifûsê, pere li ber hejmartin ku du bira li me zêde bike. Ku bavê min jî li Swissreyê çî gotîbû, ez nizanîm.

Rastîya xapînok

Li Swissreyê çar-pênc salên me baş derbas bûn. Em li her şemî yan ji yekşemîyan diçûn dawetekê, sinnet yan ji zewacê. Me bi sedan û hezaran însanê ji doraliya me didît. Ez bawer im, kêfa me bi hevdu dihat. Wexta ku pereyê ku xelat dikirin bi "apolo" dixwandin, em nêzik wan dibûn û me destên xwe xurt li hev dixistin. Bavê min digot, li daweta lawikên min hin pir însanên werin. Lê mixabin wî daweta me nedît. Ez serê te neêşînim û kin bibirim û bêjim ka çima?

Birayekî min î biçûk û birayê min î "sexe" guh li me û dibistanê nekirin û qirara rêya xwe bi xwe dan. Ji heftê carê mamosta wan dihat mala me. Jî nika porspî li ber me û birayên me digeriya ku ew werin dibistanê û li vir ningê xwe bi zarokên din re heynin û dînin. Wexta ku jînikê digot lawik ê 'agressîv' in, me digot ew ne rast e. Wexta ku wê digot: zarokê xwe bikşînin psîkologê dibistanê, me digot ew ne dîn in. Wexta ku wê digot: zarokên

xwe ji vî xanîyê biçûk derxînin bibin nav daristanê ku ew bibezin yan jî bileyzin, dara bişkênin, me digot, jinik dîn e. Wexta ku bavê min ji jinika mamosta re got: min li gund pêncsed pez xwedî dikir bi hev re dibir û dianî, tu nikarî yanzdeh zaroka bi hev re bibî û bînî, jinik keniya. Lê ku jinik diçû, bavê min lome ji diya min dikir û jê re digot, we nizaniye lawikên me mezin bikira. Diya min êsê xwe nedikir, bi tenê li ber Xudê digeriya. Bi dizî digot; ma te jî lawikê xelke heynaniya ser me. Bavê min ew gotina nedibihîst.

Ez ji te re hîn bêm çî, dawî gihiştke dibistanê qîrar da ku du birayên min herin dibistana taybet, dibêjin "Internat yan ji Privatschule". Bi tirkî dibejen "yatılı", ez nizanim hûn bi kurdî pê re çî dibejin. Wan gotin pereyê wê dibistanê dewlet dide, em bi kêf bûn û me jinika mamosta dawetê nan kir, lê wê got wextê min tune.

De tu were, bavê min du salan ji vê meselê bi şun da şixulê xwe wenda kir, firma wî îflas kir û ew bê îş ma, tu dizanî, ew bû "arbeitslos". Paşîngê beledîye banga me kir û got, ku perê dibistana taybet nikarin bidin, gerek em ji wê roja ku bavê min bê îş ma bi şun da perê dibistanê bi xwe bidin. Me got na, wan got erê. Wan ji me re kaxiz kişandin, em çûn cem ebûqatekî. Bi vî halî du sal derbas bûn, lê birayên min hîn diçûn dibistana taybet. Piştî du salan ebuqatê me yî ku me dorê deh hezar Frank dayîbûn ji me re got, dosya xwe bibin, ez hedî nikarim tiştêkî

bikim. Dibistana taybet birayên min kişandin malê û gotin zarokên we li zarokên din dixin. Em bi hêrs ketin, lê me hêrsê xwe bi tenê di nav hevdu de da der. Bavê min li diya min dixist, diya min digirîya, birayên min êdî nedihatî malê, bavê min heta sibê li wan digeriya, ku dihate malê ew jî digirîya.

Rojekê ji dibistanê ji me re mektûbêk hat û wan ji me re hesabek derxistîn: serî zarok rojêk dorê pêncsed Frank hesab kirine, çar sala jî tu bi xwe hesab bike ku çiqas digire! Greg me ew pere dabûna beledîyê. Me îtiraz kir, lê bê serkeftin. Me tiştêk dizanî, reîsê beledîyê û xwedîyê dibistana taybet merivê hevdu bûn, lê kesî baweriya xwe bi me nedikir wexta ku me digot, dibistana taybet şagirt pê gerez bûn û li ser milê birayên min qezenca xwe kirin, pere ji beledîyê sandin. Çend meha bi şun da polîsê biyaniya ji me re qirarek kişand û got: yan hûn wan perena didin, yan ji hûn welatê me terk dikan. Ku we pere nedan, ew dikeve sextekariyê, li welatê me sûc e. Ewqes perê me tunebûn ku em bidin. Me dîsa ebûqatek girt, me pere ji merivê xwe deyn kirin, me îtiraz kir, lê bê serkeftin. Qîrar ji mehkemê derxistin. Wexta ku tercuman ji bavê min re xwand ku wî îmza xwe avetiye bin çî, qotê me ziwa bû, bavê min got, min hîngê fehm nekiriye û îmza kiriye ku ez perê dibistana taybet bi xwe bidim beledîyê. Lê hakîm got, ez anca baweriya xwe bi kaxizê bikim. Ez

dirêj nekim, me saxiya xwe kir, cil û colên xwe heynan û em çûn cem merivê xwe li Baselê.

Me êdi benê xwe qetandibû, me nikarîbû em herin welatê xwe. Merivê me ji me re digotin, li çareyêka xwe mese kin, lê qet rêyek me din jî tunebû. Li dawiyê bavê min zarokên xwe li meriv û cîrana belav kir û bi xwe jî çû li loqanta yekî konyalî qaçax şixulî.

Ma tu mereq nakî ku çi ji me derket?

Ez li cem yekî kurd li mitfaxê kar dikim, li heftê heft rojan, bi nanozikê dişixulim. Her du birayên min ên ku li dibistana taybet bûn ji aliyê yekî Swisrî ku xêrxwaz bû hatin birin, mêrik çend salan bi şun da ji jinik û

malbata xwe veqetî, birayên min niha bê ar û mal in, îdara xwe bi dizî û pasîyê dikin. Her du xwişkên min li cem merivên me man, wan gotin ew kêçik in û em ê xwe bi ser wan re bigrin, lê xwişka min a mezin hîn ku salê xwe zewacê nehatibûn bi yekî kumarcî re revî, wî sê meha bi şun da, wexta ku saxiya jê kir, ew berda. Ew niha ji me re bûye kuleka giran. Yê din jî îdara xwe roj bi roj dikin, tirsî ku em werin girtin, mîna barekî giran li ser milê me ye..."

Wexta ku wî xortî çîroka xwe qedand, em demekê direj bêdeng rûniştin, me li însanên ku di ber me re derbas dibûn mese dikir. Em bawer bûn ku her yek ji wan çîrokek xwe hebû. Çîrok her bi êş in. Wexta ku em ji hevdu weqetiyar baran êdî nedibarî.


Ömer Sarihan: Ji alîyê ekonomiyê de ez î rehet im lê bi kijan bedelan

"Mîrovatî berî politika, zanîn, hûnerî û dîn hevçiyê xwarin, vexwarin, bicîhbûn û kinca ye"

F. Engels

Jîyan koçerî ye. Koçerî ne macera ye, ji mecbûriyetê ye. Însan ji welatê xwe, ji malbata xwe, ji yên ku jê hez dike

vediqete û barî welatên dûr, welatên xarîb û cîhên nenas dike.



Ömer Sarihan piştî jiyaneke ew qas sal



Ömer bi xanima xwe û torinê xwe va

Tarixa rewendîyê wek dîroka mîrovatîyê kevn e. Sedemên koçberîyê sîyasî, aborî û şexsî ne. Însanan yek bi yek, yek caran jî bi komasîyê va wek kurdên Anatoliyê ji axa xwe koç kirine û li cîhê din bi şun bûne.

Îro li dunê bi kemasi 20 milyon penaber hene û jîyana wan pir dijwar e.

Ömer Sarıhan kurdekî ji Anatoliya Navin e û jî gundê Bîrtalkê ye. Ew 26 sal in ku li Stockholmê dijî.

Ömer tu dikanî xwe bidî naskirin?

-Ez î jî gundî Bîrtalkê me. Bîrtalkê reşî ne û jî eşîra omera ne. Gundê me heta sala 1954an zozanê Omera bû. Bîrtalk li sala 1954 kete statûya gund. Qeza me Kulu ye. Wîlayeta me jî Konya ye.

Gundê me qîrarê 320 mal in nifûsê xwe nezîkî 1800 kes in. Piraniyê insanên gundî me li Ewropê kar dikine.

Ez î bi jineka fînî ra zewicî me. Çar zarokên min hene. Dudu yê jî jina min a siftê ne, duduyê din jî jî jina min a fînî ne. Xwedê rahma xwe lê bike, jina min a siftê di 1982an de wefat kir. Ew a kurd bû.

Kalê min taqîben di dû şerê yekemîn re jî qeza Eleşkirtê ku girêdayê bajarê Agiriyê ye, hatiye Anatoliya navîn.

Berî ku vere Bîrtalkê ew li Qayseriyê demekê maye. Ji dûre hatiye Koçhisarê û jî wê derê jî bar kiriye, hatiye li Xelikê jêrî bi cîh bûye. Kalê min li Xelika (Gölyazi) ji Usivê Behzat ra rênç-

ber dawastiye. Wê demê Usuvê Behzat keriyê xwe yê pêz hevînan tînaye Bîrtalkê. Ew jî bi wana ra hatiye vê derê. Demekê bi şun da jina kalê min dimire û ew dixwaze bi jineka Bîrtalkê ra bizevice. Jina ku kalê min vê ra bizevice diwê ku ti li Bîrtalkê mayî ez a bi te ra bizewicim û kalê min weng li Bîrtalkê bi cîh tewe.

Malbata me nivî li Xelikê jêrê timên yên din jî li Bîrtalkê bi şun tewin. Xalên bavê min û pismamên kalê min ê bar dikin terin Denîzliyê. Sedemên ku ew bar dikin terin dibên: *em ê li vê roma rûtik çi bikinî...* Ew li Denîzliyê

gundekî ava dikin ku navê wî gundî jî Aşagi Şamli ye.

- *Tu kingê hatî Swêdê?*

- Ez li sala 1979 hatime Swêdê û min 1982ê da desturê runiştandinê girt.

Di ber hatina min a Swêdê ez demekê li Danmarkê mam. Di wir ra derbase Swêdê bûm.

Min li gund şifêrî dikir. Wê wextê kamyona pare dikirin. Min got ez ê herim Alamên salekê, du salên xwe bişoxilim û vegerim welêt û



Dê û bavê Ömer



Her du xwengên Ömer

kamyoneka xwe ya MAN-520 bistînim. Kêfê xwe mêmîkîm. Lê wang newû.

Piştî ku min destûr li Swêd girt, min li McDonald`sê dest bi kar kir. Demekê bi şunda ez çûm kursa *fordonmekanik*. Tabî di vê naborê da ez diçûm komela kurda û min bi hevalên ku bi vî karî mijûl dibûn re jî kar dikir.

- *Te wek hosta kar kir?*

- Lê min wek hostê ereba kar nekirîyê. Ji kursê bi şunda min li restaurantekê dest kavuştinîyê kir.

- *Tu niha çi kari diki?*

- Min salê 1986 dest bi şifêriyê kir. Min demekê otobosa handîkapan ajot û bi

rû da jî min teksî dajot. Wextekê bi şunda min çend heval, ew şirketa ku min teksî li ba dajot meşand û ez hîn jî wî karî berdewam dikim.

- *Jiyana li derveyî welatê çing e?*

- Hasretê her şevakê xwe wek kevirekî reş bi ser dili min da berdid. Bîra gund dikim, bîra bihnê dumanî zowê, bîra nanî ser selê, bîra bihnê axê ku ji baranê bi şunda tê, bîra cihên ku min bi hevalan va lê list, na bê ne jî qalê bike. Xarîbî zor e. Ji alîyê ekonomiyê de ez î rehet im lê bi kijan bedelan!

- *Ji bo te Bîrnebûn çi îfade diki?*

- Bîrnebûn ji bo min ansîklopediyake dîrokî, çandî û hunerî ye. Bîrnebûnê

em bi tarix, kultur û çîrokên xwe ve hûnîn cem hevdu û ji me re rêberiyê dike. Bîrnebûn ê zimanî me pêşte tewê u xezîna kelîmên me zêde dike. Birnebûn ji bo ku em xwe rind îfade bikin û kurdên din fam bikin alîkariyê dike.

Bîrnebûn ji bo ku em xwe nasbikinî û xwebewariyê (özgüven) me bilind biwe çavkaniyeka baş e.

Ji însanên Bîrtalkê ricake min heye ku ma piştgirtîya Bîrnebûnê bikin.



Diya Ömer û neviyên xwe

DESTYEK KURTENIVÎS

Dawîya “Şerê Min”

Kîtaba Hîtler ya bi navê “Şerê Min” li Tîrkîyê bi hewêseke mezin tê xwendinê. Pir kes vê ecêb dibînin û rexne dikin û dibên, di kîtaba Hîtler da, pesnandina nijadên arî û qenctirbûyîna wan û qala nasyonalmê û kolekirina nijadên ne arî tê kirin. Çima dixwînin meriv fehm nake. Ma ev tişt li Tîrkîyê tunene? Dîsa jî ez dibêm, li Tîrkîyê xwendina kîtaba Hitler ne xeraw e. Yê ku “Şerê Min” xwendîye, ê bi dawîya şer û şikestina Hîtler jî bihese û belku pê vê, heş were sêrî.

Bêtehemûlîya Încovî û Omerîyan Încovî tehemûle çar malbatên roman (cîngan) nakin. Încov (Yenîcoba –Cîhanbeylî) qesebayeke kurd e û deh-panzde hezar nifûsa wê heye, lê şa nake ku bi çar malbatên roman va dewarê bike. Birek jî mezinê Încovê meşîyane çûne ber beledîyê, rom lanet kirine. Birek xort jî bi sedan îmze berehev kirine birine dane reîsê beledîyê û jê xwaztine ku ew roman ji Încovê biqewtîne. Çima? Rom bi dizîkirinê tîrî gunekarkirin. Erê, dizî ne çê ye û miheqaq sedemên xwe jî hene. Ji dizîyê ra çare heye, lê ew ne qewitan-din e. Xort û zarokên kurd jî li Stam-

bûlê dizîyê dikin. Kê bi kê kanîye, ma Stambûlî jî wana biqewtînin, ne weng e? Nijadperestên tirk tehemûle kurda nakin, Încovî jî tehemûle romana, ma çi ferq heye? Dizîkirin bahane ye, sedem piçukdîtina romana ye, bêtehemûlî ye.

Ma bêtehemûlî û bêtoleransîya ha tenê li ba Încovîya heye? Na, ev teybetana li derê din jî hene. Havîna çûyî, Omerîya jî bêtehemûlîya xwe li amancî mêrdînîya nimandin. Omera (Tavşançali-Kulu) jî qesebayeke kurd e, bi şeş-heft hezar nifûs e. Lê Omera jî bi hemcisnê xwe, çend sed kurdên mêrdînî yên ku ji ber şerpezeyî û tune-yîyê bar kiribûn hatibûn li Omera bi cî bûbûn va, dewar nekir. Hen Omerîyan hing û danhevîya di navbera du kesan da kirin bahane, nig dan ser mêrdînîya, xwe di wana ra xwarin û xwaztin ku wana ji Omera biqewtînin. Çima ku mêrdînî ji paşê da hatine, ew li ba xûmalîyan (yerli) wekî mihecîr tîrî binavkirin û bi çavekî piçûk lê tîrî mêzkin. Gerek e, ku meriv rokê pêş da, van teybetên neçê û neheq biterkîne. Însanîyetî û demokrasî ew e, ku meriv heq û huquqa ku ew layiqî xwe dibîne, rewayî hemberên xwe, kom û etnîyên cihê jî bibîne.

Tehrîq û gêna vemirî

Bêraqa (alaya) tirka li Mersînê ji destê du zarokên kurd da kete herdê, teyê bigota, qey herd hejîya. Bi hezaran tirk firîyan kûç û kolana û xwe berdan vir û wê. Tirkê miletperest pir zû tehrîq dibin, ku navê kurd û Kurdîstan dibihîzin û bêraqa kurda dibînin, bizutî dibin, bi cina dikevin. Helbet ya tirka jî tevê, bêraqe her miletêkî hêjayî hurmetê ye. Lê ka hurmeta ji bêraqa kurdan ra li ku ye? Bêraqa kurda sed sal e ku li herdê ye û tê bînpêkirin, dîsa jî kurd di xwe da nalivin û tehrîq nabin, tuyê bibêjî, qey gêna wana ya tehrîqê vemiriye.

Li ser tehrîqa bêraqê, li pir bajarên Tirkîyê hêrişên wekî serhildanên nijadperest çêbûn. Di van serhildanan da hevkarîyeke balkêş pêk hat: Serfermandarê artêşê (ordî) li pîpikê xist, dû ra hêzên nijadperest hêriş birin ser kurda û tirkê demoqrat, polêz gunekar cihîştin, mexdûr girtin û biçav kirin, hukumeta partîya Sipî (PS) jî polêz pesandin û jê ra dest li hev xistin. Biratî, dostanî, tolerans, mafê ferdan, millet û komên etnîcihê ka? Pîrê nemire, demokrasî tê!

“Vulpes vulpes Kurdistanîkus ê rehmetîkus”

Merivekî ecnebî, nizanim kîngê, herhal sed salî di ber vê bûye, li Kurdistanê gerîyaye û raste ruvîyekî sur hatiye. Wî navê, “Vulpes Vulpes Kurdistanîkus” (Ruvîyê Kurdistanê) li wî kiriye. Ruvîyê me, bi vî navî dikeve nav rûpelên lîteratura sernetewî. De tu

were wê, ku çî hîkmet e, ne tirka ne jî kurda bi salan hay jê vê nebûn. Kîngê ku sazîya Yekîtîya Miletan (UNDP) bi minesebeta parêztinê qala ruvîyê sor yê cînskêm li Kurdistanê kir, kurd û tirk hîngê pê hêsiyan. Ku çî bû, ji vê şûn da bû. Aniha jîyana ruvîyê sur ketiye tehlûkê. Çima? Qe pirs nekin, navê wî lê bûye bela. Ruvî him sur e, him jî Kurdistanî ye. Van her du xususiyetên wî, li serê wî bûne du belayên sur.

Tirkên miletperest bi nawê wî ragerîn, bizutî bûn. Wezîrê hawîrdorê (jîngêhê) navê wî wekî tehlûke ji bo sazûmana dewletê ya ûnîter dît û ferman da ku navê wî bê guhêrîn û wer jî kirin. Kurd li ruvî xwedî derketin. Lê aşkere ye ku, ew ji jîyandina wî pirtir li paşnavê wî xwedî derdikevin.

Ruvîyê xêrnêdî hay ji van tiştan neye. Xwedê dizane, ku jê bipirsî, ew ê bazde û bibê, “hawar ha hawar, ez mam bê cî û war, kes tune ku min ji destê tirk û kurda xelas bike; min bigîhîne welatekî Ewropa ku ez lê iltica bikim!” Ku ew bê ziman, ew ê herhal wer bibê û heqe xwe ye jî. Edin ji wî ra rehetî tune. Dewletê dest daye ser vê pirsê, mîna neçîrvanêkî çavsor ketiye pê ruvîyê sur. Herçiqas navê wî li Tirkîyê guhêrîne jî, mesele pê vê, bitûn halnebûye. Di lîteratûra sernetewî da, ew hîn wekî ruvîyê Kurdistanê tê qebûl kirin.

Tirkîyê ji bo halkirina vê pirsê, xwedê dizane, A û B du plan hazir kirine. Li gorê A yê, dewletê bi rêya dîplomasiyê û rûşwetdayîne hewl bide, ku

navê ruvî di lîteratûra sernetewî da biguhêre yan jî rake. Ku bi vê biserneket, dor tê planê B. Ligorê B ya ku Xwedê dizane, di civîna Konseya Ewlekarîya Milî (“Millî Guvenlik Kuru-lu”) da qerar li ser hatiye dayîn, tayekî (tîmekî) taybet, wekî JITEMê, li ser navê “RUVÎKÊM” bê çêkirin. Wezîfeya “RUVÎKÊM”ê ew e, ku çiqas ruvîyên sur hene berehev bike û bikûje. Bi vê rê, wexta koka wî anîn, tê hêvîkirin ku, navê wî ji lîteratûra sernetewî derbikeve. Ku va plana çû sêrî, xelk ê vê carê jî bibê, “Vulpes Vulpes Kurdistanîkus ê Rehmetîkus!”

Miqetname

Havînan li welatên Ewropa pir kes tetîla xwe li welatên dorberê deryayê sipî derbas dîkin. Wezaretên wana yên kar û barê derva carina dîqet an miqetnameya derdixin û pê hemwelatîyên xwe di derbarê tehlûkeyan, wekî teror û nexwaşîyên neçê, şîret û hayadar dîkin.

Ez jî dixwazim pê vê miqetnameyê xwendevanên Bîrnebûnê yên

ku bixwazin vê havîne tetîla xwe li Tirkîyê derbas bikin, li ser tehlûkeyên ku wana dipên hayadar bikim.

Xwang û birayên tetîlxwaz, bi gurê min bikin, van nav û gotinên ku min li jêr rêzkirine li Tirkîyê neyînin ser zimanê xwe, qet nebêjin. Ku we bi gurê min nekir, hun ê zîyanê bibînin, paşê nebên, tu kesi negot û em haydar nekirin:

- Ruvîyus surîyus Kurdistanîkus
- Pezîyus Mîyîyus Ermenîkus
- Hemsîyus Masîyus Lazîkus
- Rindîyus çavkeskîyus Çerkezîkus
- Îsmailîyus kurdhezîyus Beşikçîkus
- Ahmedîyus şorxwaşîyus Altanîkus
- Orhanîyus dobrayîyus Pamukîkus
- Kerkukîyus dilîyus Kurdistanîkus
- Ermenîyus Komkujîkus Tirkîyîkus
- Bavoyus min bişînyus mektebîyus kurdîkus

Oxir be ji we ra, tetîla we li gor dilê we derbas bibe. Jibîrnekin, dîqet bikin, miqate xwe bibin!

Li Stockholmê pêşangeha kilîmên Kurdistanê

Di 16ê nîsana 2005ê de Li Stockholmê; paytexta Swêdê li Muzeya Etnografyayê pêşangeha merşên (berên/kilîmên) Kurdistanê yên derûdora Culemêrgê (Hekarî) û Wanê hat vekirin. Pêşangeh ji bal Muzeya Etnografyayê, Kitêbxaneya Kurdî ya Stockholmê û Federasyona Komeleyên Kurdistanî yên li Swêdê hatiye vekirin. Pêşangeh ê heta dawîya meha 10ê vekirî be. Divê navberê de programên cuda yên li ser kultura kurdan jî li Muzeya Etnografyayê tên amadekirin. Pêşangeh ji bal kurdan û swêdîyan bi balkêşî hat pêşwazîkirin. Em jî çûn me pêşangeh dît û me ji bo xwendevanên Bîrnebûnê hevpeyvînek bi berpîrsê pêşangehê ê ji welêt re kir.



Alî Çiftçi di hevpeyvînê de bi Abdulkadir Garipgazioglu re



Konê reş ê kurdan di pêşangehê de

- Ji kerema xwe re tu dikarî hinekî xwe bi xwendevanên me bidî nasîn?

- Navê min Evdilqadir e. Ez ji Culemêrgê hatime. Karê me li ser berikên herêmê, berikên kurdan e. Em li ser hemû awe berikan kar dikin. Di pêşiyê de armanca me ew e ku em berika Culemêrgê biparêzin. Jina kurd, dayikên me 22 cureyên berikên kevn ên Culemêrgê çêkirine. Ji bo zarokên xwe ji bo xemilandina mala xwe, ji bo her tiştî çêkirine, nexîşandine, lê mixabin ew niha wenda dibin.

Di destpêkê de gava me li Culemêrgê atolye vekir du sedemên wê hebûn. Yek wextê ku gund hatin va-

lakirin û şewitandin însan hatin ketin nav bajêr, bêkar man, nikaribûn xwe xwedî bikin, Me got gelo em çi bikin, em tiştêkî wisa bikin ku tiştêk ji de-



stê me neyê jî em cihê karekî wiha peyda bikin qene 10 malbat kari-bin ji alî aborî de pê xwe xwedî bikin. Me projeyeka wilo destpêkir. Me atolyeya berikan vekir. Me keçikên 24 malên feqîr û belengaz ên ku dewletê gundên wan xera kiribûn, ew koçber bûbûn hatibûn nav bajêr, anîn di atolya xwe de bicîh kirin.

- *We ew perwerde kirin?*



- Perwerde jî bûn, lê ji xwe hinan hê ji dayikên xwe fêrbûbûn, dizanîn.

- *Li Culemêrgê çawa ye, her kes dizane kilîman çêke?*

- Li dora Culemêrgê, bi taybetî li gundan pir kes dizanin.

- *Meriv dikare bêje ku karekî rojane ye?*

- Belê karekî rojane ye û wextekê ji bo xemilandina malan pêk dihat. Niha li herêma Culemêrgê însan ji bo pê xwe îdare



Medya Garipgazioglu ya ji Colemêrgê li ber tevna beran li Muzexaneyê



Enise Aktaş ji Colemêrgê li ber bereka kurdî a ji keda destê wê


bikin, xwe perwerde dikin. Ji bo wê niha çêdikin. Me jî ev kar destpêkir, kesên ku nedizanîn jî, me ew perwerde kirin. Em dixwazin ew kesên ku li ba me kar dikin hemû cureyên berikên kurdan bizanibin.

- *Ev karê ku hûn dikin helbet karekî pîroz e. Kultureka kurdan a kevn a wê herêmetê parastin. Helbet wek niha te got hem xelk rojane pê îdareya xwe dike hem jî kulturekê tê parastin, pêş de dikeve. Gelo ji bo vî karê we tu dezgeh*

piştgiriya we dikin? Dewletê heta niha qet piştgiriya we kiriye? Gelo dewlet jî dixwaze ev karên wiha pêşkevin, yan ev însiyatîfa ku we girtiye însiyatîfeka şexsî ya meheli ye?

- Ji xwe li Tirkîyê dewlet ti carî nabêje ev huner, ev kar ê kurdan e. Der-


dekî wan ê parastina kultura qewman tuneye. Ne tenê a kurdan, a erëban, a çerkezan, a lazan, a ermenîyan jî ... Ji hemîyan re jî dibêjin tunene. Ji xwe her tiştê tirka



ne. Navek danîne, he-
ma a kê be jî dibêjin
"Anadolu kilimi."

Lê wextê me bi
xwe dest bi berikan
kir me got ev berik
yên kurda ne, li herê-
ma Culemêrgê me
dest pê kir. Gava em
çêdikin jî em dixwa-
zin li ser navê kur-

dan bên firotin. Yanî ev berik a Cu-
lemêrgê ye, karê kurdan e, jina kurd
çêkiriye. Nexşên ku tê de hatine çêki-
rin maneya wê wateya wê ev tişt e.
Em dixwazin van biparêzin, ew kesên



ku tê de kar dikin jî
van hîn hibin. Biza-
nin ji bo ku çanda
me wenda nebe, her
bijîtin.

- *Gava ez li pêşangehê
geriyam bala min
kişand, min hin navên
kurdan ên kevn ên
nexşan yên alavên din
dîtin. Gelo hûn wan na-*

*van li welat jî bikar tînin, Kes tu mişkileyê
ji bo we dernaxe?*

- Di karê xwe de em wan navan bikar
tînin. Di nava gel de jî, ji xeynî me jî
atolye hene, hinek bikar tînin, hinek



Bereka kurdî li pêşangehê



Tevna beran jî ji Kurdistanê hatibû pêşangehê. Ebise Aktaş li ber tevne

beşekî ji wan bikar tîne. Di atolyeyên dewletê de ji xwe ew nav nayên bikaranîn. Şirketên wek ê me ên serbixwe û şexsî navên kurdî bikar tînin. Wekî din berê dayikên me gava ew berik çêdikin hiriyê herêmê bikar tînin, hirî bi teşiyên diristin. Boyaxên hiriyê ji rengên kokên giyayan dihatin derxistin, her tişt bi destan dihat çêkirin. Hirî bi teşiyên dihat ristîn dibû rîs. Ji bo ku di berika Culemêrgê û ya Wanê da hemû



rengên berikan ji sedî sed ji giyayên herêmê tînin derxistin, em jî dixwazin wê kulturê biparêzin. Berî 50-100 salan dayikên me pîrejinên me ew hemû rengên berikan bi çî awayî, bi kîjan metodan ji giyayên herêmê derdixistin em dixwazin hîn bibin û wan metodan bikar bînin. Loma em niha lêkolînan li ser wê dikin.

- Gelo ew berikên niha li vê muzexaneyê ne jî rengên wan ji giyayên wan herêmên Kurdistanê hatine derxistin?.

- Belê rast e ew berikên ku niha li vê derê ne hemî

bi reng û boyaxên rehên giyayên herêmê hatine rengkirin. Lê mixabin ji ber ku gund hatin xerakirin û şewitandin hin giya bi zehmetî tên dîtin. Mesela rengê şîn. Ew ji giyayekî çê dibe ku wek daran e. Navê wî îndîgo ye, jîngeha wê hatiya xerakirin îdî têra xwe şîn nabe. Ew giya niha ji Meksîkayê ji me re tê, em bi pere dikirin.



- Belê navê wan hene. Runas e rengîn e, tevî ye, giyareng e, şîmar e, tîrşoka ga ye. Ev hemî giya ne. Her giyayek rengê jê çê dibe. Carina jî em avên giyayan tevîhev dikin, rengên guhurtî yên taze jî derdixin. Li atolyeyên me perwerdeya wê yekê heye ku hemû karmend divê bizanin giya çawa rengê jê tên derxistin.

- Gelo ew rengên ku hûn ji giya çê dikin navê wan giyayan hene?

- Gelo ew nexş, motif û dîzaynên we ên kevn ên klasîk in, yan yên nuh ên modern ku hûn derdixin holê jî hene?



Sê berên kurdî di dema pêşangehê de li Muzexaneyê Etnografyayê de

- Gava meriv li berika Culemêrgê dinêre meriv romanekê tê de dibîne. Tu bêjî romana çî? Romana jinê meriv tê de dibîne. Ji ber ku em di civakeka girtî ya feodal de bûn, jin bindest bû. Jin tim di kar de bû, tenê dima, di bin zilmê de dima, hewî bi ser de dihat, gelek zarok dianîn, diçû pez û heywan xwedî dikirin. Ji bo mêrê xwe û zarokên xwe gore çêdikirin. Ji bo xemla mala xwe berik û tiştên din pêk diîna. Jin her tim di kar de bû keça kurd jî wisa bi tenê bû. Yanî hestên xwe, fikra xwe, ramana xwe, acizî û xweşî û nexweşiyên xwe de her tenê bû, kes pê re tunebû ku ew li ser pê re xeber

bide. Dinya wê pir piçûk û teng bû. Loma jî eşq û evîna xwe, bîr û bawerîya xwe, jixwebawerîya xwe, keda xwe kiriye nexş daniye di berikê de. Ji ber vê jî em dibêjin berika herêmê, berika kurdan romana jinê ye, her tişê wê di nav de ye.

- *Te got ev keşên ku vî îşî dikin keşên çîwan ên kurd in. Gelo meriv dikare bêje ku kesên vî îşî dikin hunermendên vî îşî ne? Hunerek, çîrokek di vî îşî de heye?*

- Rast e. Em dixwazin bêjin berika Culemêrgê romanek e ku nivîskarê wê jina kurd e. Ji ber ku her tiştê xwe bi nexşan hûnaye. Helbestvan derûnê



Tevnanî di jiyana koçerîyê de



Tevnoanî li jiyana gundîtîyê

xwe dixwe helbestan, wê jî di nexşan de daye diyarkir.

- Gelek balkêş e. Ev bû çî qas wext hûn li vê derê ne?

- Ev bûn du hefte ku em li vê derê ne.

- Ji destpêka pêşangehê heta niha rewş çawa diçe? Çawa hat vekirin? Balkêşî gelo heye an na? Çî qas însan çûnûhatin gelo?

- Welle ji bo me pir pirr giring bû. Erê ez karmend im, lê bala min gelek li ser kulturê ye, zaafa min, hezkirina min a ber bi kulturê de gelek e. Ez dixwazim huner bê parastin û nîşandan. Wek hemû gelên dinyayê me jî sinetek heye, jina kurd jî xwedan huner û çandeka hêja ye, çima neyê

naskirin? Em di hemû muzeyên dinyayê de dinêrin ên hemû gelan, huner û çanda destê wan; a ereban, tirkan û farisan heye, pêşangeh tên çêkirin, tên nîşandan, xelk nas dikin, ew dikevin kitêban, ê çima ê kurdan nebin! Bi rastî gelek giring e, belkî jî cara yekemîn e hunera dest a kurdan li welatekî wek Swêdê li Muzexaneya Etnografîyê hatiye nîşandan. Bi rastî ez pir pê kêfxweş bûme.

- Roja pêşî ez jî li vir bûm. Gelek însanên cur bi cur hatibûn, Xort û ciwanên kurd, mezin, swêdî, gelek însan hatibûn. Te çî hîs kir?

- Ez pê kêfxweş bûm, biyanî swêdî gelek bûn. Lê tu rastiyê bêjî min dixwest

kurd jî gelek li vir bûna, pê serbilind bûna û ji swêdiya re bigotana "a ev çanda me ye". Çanda gelê me ye, jina kurd vê hunerê dike. Pê serbilind bûyana. Mixabin têra xwe kurd nehatibûn. Lê dîsa jî ez pê serbilind im. Gava em ji welat hatin, me du keçikên ciwan li gel xwe anîn. Alav û dezge û tevn anîn ew li vê derê nîşan didin ku meriv çawa van berikan çêdike. Xelkê vê derê dibînin ku ew çawa yeko yeko tava tevnê bi tiliyên xwe radikin û çêdikin. Hunerê me bi vî awayî baştir tê naskirin.

- *Ev pêşangeha we ya yekê ye yan we berê jî pêşangeh vekirin?*

- Na ev ne a yekê ye. Em berê jî li ser navê fîrmaya xwe şexsî çûne gelek welatan li pêşangeha beşdar bûne. Lê ne wiha resmî û bi vê mezinayiyê. Bi vî awayî ev cara pêşîn e.

- *Dixwazim di dawiyê de pirsêka din bikim. Kovara me kovareka kulturî ye. Kovara kurdên Anatoliya Navîn e. Li ba me jî heta van demên da-wiyê xalî û kilim dihatin çêkirin. Lê niha ew hêdî hêdî wenda dibin. Tu li ser kurdên anatoliya Navîn çi zanî, dikarî çi bêjî. Te gotinek heye?*

- Min navê kovara we bihîstiye. Kurdên me yên Anatoliyê piraniya wan ji dema osmaniyan de sirgûn bûne. Di serê min de welê bû min digot qey wan xwe wenda kirine, asîmîle bûne. Lê gava min dît ku kurdên Anatoliyê xwedî li kultura xwe derdikevin, di çapemeniyê de cihê xwe girtine, ez gelek gelek kêfxweş bûm. Ez serbilind bûn.

Ji bo xalî ku hûn dibêjin xalî em dibêjin mafîr, ji bo ku rêşikên wan zêde ne, nerm e navê wê "mafîr" e. Li ba me jî çê dikin. Ya dî ya dax tê rêsan-din ew berik e, ew jî tiştêkî taybet e di nav kurdan de, lazim e ew jî bê parastin. Hêvîdar im ev pêşangeh berde-wam bike li welatên Ewropayê ên din jî bê danîn, kurd aleqe nîşan bidin, kêfa wan jê re bê, ev geş bibe bibe nimûne ji kurdên din re.

- *Gelek sipas ji bo ku te wextê xwe da me.*
- Ez jî sipas dikim, ji bo elaqeya we. Hêvîdar im ev pêşangeh berdewam bibe û geş bibe. Karê we jî her ê kulturî û nivîsînê be û pêş de biçê.

Germikê (Arşincî)

Cîhê ku Germik lê ava bûyî di wextê yonanîya da jê ra digotin; Lykaonien û di dema roma de jî navê wê navçê(bölge) Galatya bûye.

Germik ê li dawiyê çiyayê Karacadagê bi cîh bûye. Li rojavayê Germikê Kirkpınar (kurd), li bakur Hêsar (kurd), li rojhelat Boğazören (tatar) û li başûr Xelikan, Karacadag(kurd) heye.

Germikî yê Reşî ne û ji eşira Xelikan in. Eşîra Xelika dema ku ji aliyê Sîvrîhîsarê da berve deşta Konyayê bi rê ketine, siftê li Germika êwrî ne û ji dû ra barkirine çûne li Xelikên jor (Karacadag) bi cîh bûne. Germik bi salan yayla Xelikên jor (Karacadag) bûye.

Germik li sala 1956 ketiyê sitatûya gund û girêdayê Kuluyê ye. Ji Kuluyê 19 km ye.

Li gora hejmartina sala 2002an nifûsa Germikê 267 kes in û bi insanên ku li derveyê Germikê ne va nifûsa gund nezîkî 550-600 kesî ne.

Navê Germikê ji kanîya avagerm tê û bi tîrkî tê mana "kaplica".

Malên li Germikê:

Xellê Xana: (Yalçın, Doğan, Koyuncu, Kaplan)

Qemera (Ciftci,Yildiz, Altay)

Dimilî: (Çelik, Kisabacak)



Dîmenek ji Germikê

Merşeka Kurdên Anatoliyê li Swêdê (1893)

Li Swêdê di muze, bîbliotek û di arşîvaxaneyan de mirov rastî gelek tiştên kurdan tê. Wusan jî hin xaliçe, merş, emenî û berên kurd di muzeyên swêdî de tînin parastin. Di derbarê vê babetê de hin zaniyarî di pirtûka min ya bi nave *Svensk Kurdisa Kontakter under tusen år* de cîh girtine. Yek ji van merşên (ber û emenî, kelîm) kurdên Anatoliya Navîn niha li Swêdê tê parastin, ji aliyê kurdên reşwan (ên Anatoliya Navîn) hatiye çêkirin. Ev merşa di sala 1893an de ji aliyê Wilhelmina von Halwyl (1844-1930) de li Parîsê hatiye standin û wê xanima swêdî ev merşa kurd paşê aniyê Swêdê û niha li Stockholmê, di Hallwylska Museet de tê parastin. Yek ji sûretên vê merşê di sala 2004ê de di nav rûpelên pirtûkeke merşan de hatiye weşandin.¹ Merş bi 145 Frankan li bazara *Au Bon Marché* li Parîsê hatiye standin. Di derbara vê merşê de ev zaniyarî tê pêşkêş kirin: *"Rashwan (kurdisk), centrala Anatolien, 1800-talets sista fjärdeedel"*. Divê em bidin diyar kirin ku di sala (1893) an de dema ev merşa hatiye Swêdê, di eyni salê de kurdê pêşîn Swêd ziya-

ret dike, navê wî Mîrze Seîd bûye. Ji Kurdistana Îranê hatiye Swêdê.

Tiştêkî mayin jî divê ez nîşan bidim ku li Muzeya Etnografîyê pêşangeheke kurd li ser merşên kurd hatiye vekirin, heta roja 2/10. 2005 vekirî ye, kesên ku bixwazin dikarin herin vê pêşangeha balkêş bibînin

(Footnotes)¹

Hallwylska samlingen av orientalska mattor och textilier, 2003, Stockholm.



Wilhelmina von Halwyl (1844-1930)

Merşa Rişwaniyan

*Rişwan, Anatoliya navîn, çaryeka dawîn a
sedsala 19ê, du berên bi hev ve durûtî.*

383,5-403,5x74-7,5 herwiha 391,5-394x76-78

*Çavkanî Au Bon Marçé, Parîs; Willhelmina von Hallwyl,
19 tebax(axustos) 1893, Buhayê kirînê 145 Frc
Lîteratur Berhevoka Hallwylî LX:I:E.a.2, 1937*

BENÊ TEVNÊ Ê MASÛRÎ (Benê ku
hevde lê tên hûnan): Hirî, Z2S, yek
mahî(gewrê mahî) û yek jî qehweyî.

HEVDE: Hirî, Z2S

HIMBIZÎ (DENSITY): 45-48 benê masûrî/
dm, 90-135 tayên hevdeyî/dm.

DAW (rexê dirêj/selvages) Tayên
masûrî yên bi hevdeyan alandî.


REX(rexê kurt/serî û dawî): Ser-
birînên pahnhûnayî yên bi
hevdeyên sorên qehweyî.

RENG: Duwanzde reng: Rengê
şerabî("), sorê qehweyî, zerê
mat, qeh-weyîyê tarî, qeh-
weyîyê nîvvekirî, qehweyîyê
mat, şînê tarî, şînê nîvvekirî,
şînê mat, keskê(sewz) tarî,
keskê(sewzê) mat, mahî.

NEXŞ (Motîf): Tenvexş û
nîvnexşên medalî yên derencekî
yên pirrengîn di nava xwe de
medalîyon piçûktir û kulîlkên
şewekirî(stîlîzekirî),doreperên
mahî yên bi nexşên nebatan.

REWŞ: Mehiyanên
nezêde, leke, hîvrêzkirin.

Dawên dirêj hîvrêzkirî.



ÇÊTÎR

Çend sala berê li vî gundî jîyan bi hem-dî xwe dimeşî. Warekî xwaş, warekî germ. Cihê jîyanê bû. Li vî gundi baran tijî xwe dibarîn. Li rû baranan, bi teqereqa ewran re li ezmanan brûska govend dikişand, li bihara, dema hilma biharê dikete xwelîyê, bi bîhna kulîlkên hinaran ve tev lihev dibû meriv serxoş dikir. Kulîlkan li çiyayên gund bi her rengê keskesorê vedikirin. Çemê ku di nava gund re diherikî, bi xule xula xwe mîna dengê bilûra şivanên evîndar deng dida. Gund di navbera du çîyan de, di newaleke kûr de wû. Pênce xane wû. Hundirê gund ji darên hinara xemilî bû. Malên gund, ji derva de ji keskîya daran xuya nedikirin. Li nava gund, te berjor mêze dikir, di navbera çîyan de li jor ezmanên şîn tenê xuya dikir. Ezmanê ku rengê xwe ji Behra Wanê girtî, mîna sîdankekê di ser gund re venayî bû. Gund quncikekî bihuştê wû. Bihûştê din a derewîn.

Malbatên gund xisim û merivên hevû du wûn. Li şîn û şahîyên xwe, li rojên teng, tim û tim li cem hevûdu bûn. Bi hev re li her tiştekî alîkarî dikirin. Cîran û heval bi karên dina derewin ve mijûl diwûn. Ne li xêra kesî, ne jî li şerê kesî wûn.

Çi bû, ji du salan vir de bû. Du salên dawîyê, hero leşker dihatin nav gund. Leşkerên bi kincên xerîb, leşkerên bi top û tîfing, leşkerên bi çek û rextan barkirî û serçavên xwe bi boyaxa reş boyax kirî jîyan li gundîyan teng kiriwûn. Misade nedikirin gundî ji gund bi derkevin û karê xwe yî rojane bikin. Digotin: “Hûn, alîkarîya şakîyan dikine. Hun, nan û xwarinê didine wana.” Bi van manana her ro sê-çar xort digirtin, dibirin qereqolê. Çardehe roja digirtin, bernadidan. Di qeraqolê de ewana diêngavtin û işkence dikirin. Li gundên cîran, li gor gotinan çend şivan li çolê kuştibûn û wenda kiribûn.

Li wan du salên dawîyê, te digot li gund jîyan bervajo bûyîbû. Ew rojên xwaş, rojên tiji jîyan winda bûyîbûn. Roj, di bin zilmê de, di bin zor û zordestîyê de derbas dibûn. Leşkeran, li gundîyan jîyan herimandibûn. Ar û namûs hatibû pênc pera. Her roj derbas dibûn, zor û zilm zêde dikirin. Bi ro diketin nav gund, zarokên nava gund dileyîstin, mîna kerîyên berxa yî gur pêketî, şeqe bi şeqe dibûn û direvîyan malên xwe. Ji ber wê tirs û hovê carek din bi dervediketin. Bi ser wana zilm û zordestîyan de çend

xortên gund bi dere çîyan ketin. Bi ser wê de, leşker her diçû har dibûn.

Rojekê, wan gundî li nava gund berhev kirin. Serleşker got: “Ji we re mehekê misade. Hûn ê di hundirê mehek de gund terk bikine. Hetanî mehekê, kê gund terk nekir; ez ê vî gundî jê re bikim gor” û çû. Dûwa dihate gund kî bi ber desta diket, ne digot jin, ne digot mêr ne jî zarok, bi leşkeran diêngavtin û diçû. Gundî ji jîyanê aciz kiriwûn. Êdî malbatên li gund yek bi yek ji gund bi derdiketin, ji gund bar dikirin. Berê xwe didan bajarên mezin. Axa bav û kalên xwe terk dikirin.

Xalê Mîrze ji lavê xwe Qasim re digot: “Ez dest ji gundê xwe bernadim. Narim xerîbîyê. Ez narim tu dera. Ez î heyştî salî me, ez li welatên xelkê nakim. Ez ji vê axê veqatîyam, ez ê bimirim. Ez welatê xwe, gora dê û bavên xwe li wir, ji wan kuçikan re bernadim. Ez ê li vir bimirim. Tu dixwazî zarokên xwe bigire here.” Qasim ne dizanî çî bike. Heq dida bavê xwe. Bavê wî rast digot. Bi xwe û xwe difikirî; axa xwe, welatê xwe yî ku hetanî îro zikê vî têr dikirî çing berde here xerîbîyê. Rind-xerav bi zarokên xwe ve bi cîranan ve pence sal li wir umir derbas kiriwû. Du kal û pîr, çar zarok û xanima wî, heyşt xorentan li ku bi cî û war bike? Ê çawa bi ar û namûsa xwe bi xwedî bike?

Qasim di navbera du rêyan de mayîwû. Bere xwe bide, rêyeke dawîya wê kes nizane, ji wê yekê ditirsîya. Lê li gund mayîne jî, tu tahme xwe ne-

mayîwû. Dizanî dijmin xêrê pê nake. Tiştêk jî ji dest ve nedihat. Dilê xwe dikete xortên çûyî çîyan. Pence salî wû, zarokên hûr wûn.

Şevêkê Qasimî dîsa di nav mal-xula de wû. Ji der da, bi dengê bilind şîqînî hat û taq û req kerîyek leşker kete hundirê malê. Hêze xwe kir rabe ser xwe, cendirmekî bi boça tîfingê li çenga vî xist û gêrkir. Şeş-heft cenderma mîna kûçikên ser laşa her yekî ji derekê de bi tîfingên xwe û bi copan, hena jî bi pînan ew xiş û xalî kirin. Cenderman hena jî, di quncikê hodê de Xalê Mîrza kirin halê Qasim. Jina Qasim û zarokên wana xwe li hev û du pêçabûn. Ji tirsan re qîr û bar digirîyan. Leşkeran ji hodê malê yên din û ji axur û gomê çî bi ber destan diket dianîn li nava hodê li ser hev dikirin. Ji aşxanê çalên ard, nîsk û sawar nan û çî tiştî din heye anîn hodê, ji xanîyên din jî, kerme, kong, kix, tiştê ku xwe pê germ dikirin û dişevitandin anîn. Ewana tevlihev kirin û ser hev kirin. Tiştên ji bo jîyanê bi wana geger tarê-arê berdand û çûn. Ji bo ku ew aciz biwin, barkin herin ji gundên xwe. Dû wana ve dayîka Gulê rahişte destê Gulê ew bire hoda din. Gulê, ji tirsan re xwe şil kiriwû. Derpêyê xwe, kirasê junîya di nava avê de mayî bû. Dayîka wê kincên wê guherin û aş dikir.

Gundîya êdî tu mecela xwe yî ku wê jîyanê bikişînin nemayîbû, yek bi yek ji gund bar dikirin. Berê xwe didane jîyanêke dawîya xwe nexuyayî. Beri didan rêya koçberîyê rêya şelpeze

û belengazîyê. Ji bo wana, li vî gundî tahma tiştêkî nemayîbû. Li ser wê axê, li wan çiyana, li vî gundî jîyan herimîwû. Ava çemê gund şêlî dihêrikî, gul û kulîlkên wan çiyana bi ser wê zilm û zorê de çilmisîbûn, bîhn nedidan. Bi ser wê de Gulê, bi şeva tu çav ne didane hev û ranediket. Di nîvê şevan de xelmaş dibû, di xevnên wê de cenderme dihatin. Rasere wê didan. Dirêvîya dirêvîya ji ber guran tim û tim dirêvîya. Cenderme digêhiştin wê dest dirêje gulîyên wê dikirin, dikire qîrini bi xwe dihesîya. Ji xewê radibû, yê dibin xuhyê we bûyê û nîvinên xwe yê şilkirine. Ji malbata xwe fedî dikir, sibê ji nava cihên xwe nedihate derê. Keçek wû, mîza xwe bi bin xwe de dirêvand.

Di gund de, şeş-heft malbat mayî bûn. Yê din barkirin, çûn xerîbîyê. Rojekê dû êvarê, xwarin xwariwûn. Xalê Mîrze li jor hodê rûniştîwû. Nevîyên xwe dayîbûn dor û paş xwe, ji wana re çîroka jîyana xwe kat dikir. Gulê, tu guhê xwe neyî li ser vî bû. Tirsê şeveke din di dilê wê de bû. Eceba çawa rakave? Di kîjan xevnê de, ji ber

cenderma hetanî kêderê, kuva bireve û sibê di çi halî de rabe? Dema Gulê wana di serê xwe de çerx dikirin; bi bîhna şewatê û kor dûmanekî merîya fetisîne qîrini kete malbatê. Cenderma, ji bo ku wana ji wê axê veqetînin ya paşî jî kiriwûn. Agir berdayîbûn malê, gom û axira. Ji hêlekê de deng û qîrîna zarokan ji hêlekê de dengê tereke û hêvanên di gom û axira de dişewitî, bilind dibû û tev li hev dibû. Xalê Mîrze û Qasim qîre qîr bûn, digot eman zûkin birevin derva. Heryekî bi deste zarokêkî girtibû. Dayîka Gulê jî dergûşa xwe dayîbû hemiza xwe di nava agir re dirêvîyan derva. Ji Gulê re digotin: "Zû ke, bimeşe." Herkesî xwe awitibû derva. Dû wana ve Gul bi derket, çi derkeve li derve, panz-deh-bihîst cenderman berê tifingên xwe di derî mala wana alkîrine, li ber malê ne. Gulê deqekê dudiyên li wana mêzekir û berê xwe da mala bavê xwe. Dest û milên xwe rakirin û himbêza xwe tijî xwe ji hev kir; bi dengêkî bilind kire qîrîni "Agir hê çêtir e!" got û xwe avite nava agir, bû agir.

AMAN ELO

(Versiyona Duduyan)

Erx e erx e Bêz Bêzo erx e
Heqsizê dotmama merdîvana çara da
dame ber xwe
Hetanî li vê dinê xwaş digirim
Bervankê mêrî kotî nadim berxe

Aman Elo aman Elo
Porê pir î li te bû bela
Xwedê emrekî pir bi min te de
Min bikişanda tela bi tela
(revan)

Ez ji koşa narime koşa
Tu çi bûyî pirteqala dest nexwaşa
Ez î îstegekê bidim Îsmet Paşa
Ma ji qelin daxe panzde qurişa

Aman Elo Aman Elo
Bejna zîrav dîragê kela
Hetanî li vê dinê xwaş digirim
Ez jibîrnakim navî hena

Here lê lê Ele Xagê
Orxanê bavê ser doşagê
Were desti xwe di destî min ke
Qelinî vî zemanî zor e guca min nagê

Ro hilat xwe da çîyakî
Şevqa xwe da çetel qapîkî
Qurbana te Xwedêyî me
Va çi sevdê te dayî min merîkî

Ro helatî çiya bilind e
Şevqa xwe da bejna rinde
Her ku çavê bejna te ket
Ez î dînik bûme li nava gunde

Li devê ozê li devê ozê
Bejna te rindê dara gûzê
Kî Ele gewri min nasneke
Yeke kinik e xerca hamêzê

Li devê ozê li devê ozê
Xelkê şijin gozer heyнан çûne fêzê
Xwedê dil miradê min te bikira
Ji te ra xanina çekim ji darî gûzê

Ez nexwaş im narime mala
Cîyê min bikin li ber dîvara
Keserê min tene li ser kesera
Serê'm dînin ser kevira

Ez bi te va ez bi te va
Destê xwe di destê min ke
Nifira bîkînî li dê û bava
Elo kor bivin ji her du çava

Herem: Gölyazı - Konya

BAR BÎHATA

Ma bar bihata bar bihata
Ji yanî qılbe da ro hilata
Xwedê dil miradî min te bikira
Ma êdam qirari biderketa

Ez hayrane dev û lêva
Sûret ê sor in mîna sêva
Ez cake din narim ser etara
Qalê nakim qalê yara
Bazar nakim tiştî yara
Destî xwe di destî min ke
Herinî qeza me ya şevitî
Biderxinî resmî yara

Meke meke rîndê meke
Ez ê şorekê bêm di bêni xwe ke
Ji xwe re bi nusqe ke
Min bihîst rinda min ê sîva hatiyê
Ez î herime qeza me ya xopan
Reîsekî wûnime ji te rica kime
Ji te re zêrekî bi hezar sedî çekime
Ji eşqa xwe re bi sû te va kime
Ma yê ku dîn maşela kin
Ma rîndê min nezer nekin

De êdin were çinge zor e
Ê ji min ra bûyê tevneke
Biçîne dor bi dore

Berxê dameweste dil dudi ne
Îro dîsa li ber malê bavî te dawestî-
yane
Çima bi sal û şeşma hevû du qe
nedîne
Ji eşqa dila ra li yaqe hev du ne

Edên were çiya narîne
Bi panîya çava dibarîne

Hate malo bi dona tirî
Malşevitî şevê ji nîvi ra dibirî
Her ku çavê min li te dikeve
Ez heyname kela girî

Vê çûçikê vîye vîye
Ez derketim min go çî ye
Go min bi te va dil girtîye
Va çî dilî vê fayde yêe

Gelerî

ELÎ BERXÊ

Berxê ro ji dîya nare dîya
Ez a bi qurban bim emelê Alemin
Ji pi-baska da vestîya
Cakê li xelasîya min mêsîkin
Î dehe xorenta bi xwedî dike
Bi qizil omiz û pîya

Berxê dilê min piling e
Fabrîqa gêwir şinge-şinge e
Xwaskê va alemana biderneketa
Ê tene kî vê deste kî vê çave kî vê ninge

Te kir te kir Elî'ya te kir
Ez ê bûme şixekê ketime zikir
Li Memikî min î bi komê hûr mêsîkin
Walle dîsa bi halê min şukir

Berxê dilê min tine tine
Î bûye biroşa ar li bine
Ez bi qurbane emelê Alemên giştika bim
Sewa îşê gêwir gî ji felekê yareli ne

Elî meke dîno bi min kenî
Mîya malê kalî danê xwe dî
Ez a bi nîvî şevê ber ve Elî xwe herim
Elî bi şev ji îşê gêwir were şîvka xwe nekeli

Berxê îşev şevê bulanix e
Fabrîqa gêwire qerbilix e
Ez a bi girî çawê xwe biderxim
Yawrim ê bên ne dake anelix e

Herem : Konya

RINDÊ

(Versiyona dudiyan)

Ku da ku da şivan ku da
Şivên pezê xwe berda pêda pêda
Çavê xelkê malê dinê
Çavê'm bizbena belek benê bi pida

Rindê rindê rind rindê ha
Ez qurbana bejna zirav garê bi guva
Kirîk rinda xwe birevînim
Kirîk kewa xwe birevînim

Kesî min tune ji min şuva

(Revan)

Hatim hatim rind rindê hatim
Dawî a basmê dev te ketim
Min silav da te te heynena
Hatim xanî malê bi cina ketim

Şîva şîva rind rindê şîva
Ez qurbane bejna zirav zêrê bi su va

Şîva şîva rind rindê şîva
Ez qurbane zende qilot garê bi gu va

Te çi bi min de hêce hêce
Kaniyek vebû li rû qêrice
Kî rinda min nasnake
Mîna gula li nav kurmênc e

Herem : Konya-Qerecdax

Orta Anadolu Kürtleri*

BİA (İstanbul) - Orta Anadolu'da da Kürtlerin yaşadığını duydum da; onlarla ilk yakınlığım 1970'lerde Ankara'da mülkiye öğrenciliği yıllarımda başladı diyebilirim. Emek mahallesindeki Diyarbakır yurdunun hemen yanı başındaki bir öğrenci evinde birkaç arkadaş birlikte kalyorduk. Aynı zamanda yurdun bağlı olduğu Diyarbakır Deneği'nin de yöneticilerindendim. Her sabah Emek'ten Cebeci'ye okula gider gelirken; o hatta çalışan Ankara'nın ünlü 7-8 kişilik taksi dolmuşlarını tercih ederdik. İşte ilk kez o tarihlerden birinde (1974) Kırşehirli Kürt Mehmet'i tanıdım. O gün Diyarbakırlı olduğumu öğrenince kendisinin de Kürt olduğunu söylemişti ve başlamıştık Kürtçe konuşmaya. Sonra dost olmuştuk. Daha sonraki karşılaşmalarımızda ise, her defasında zorla para vermek durumunda kalmış ve yol boyu Kürtçe-Türkçe sohbetlerimizi sürdürmüştük. Bugünlerde epeydir kitaplığımda durup durup bana bakan ve ne zaman okuma sıram gelecek diye bekleyen Rohat Alakom'un "Orta Anadolu Kürtleri" kitabı elimde. Rohat'ın kitabı daha önce İsveç Stockholm'de APEC** yayınevi tarafından basılmış.

Türkiye'de de Evrensel Basım Yayım yeniden elden geçirilmiş ve genişletilmiş halini basmış. Kanımca, bu güzel kitabı okurla buluşturmakla iyi de etmiş yayınevi. Kürtler deyince bu ülkede hep coğrafi olarak Anadolu'nun Doğu ve Güneydoğusunda yaşayanlar bilinir. O denli öyle bilinir ki, "Bölge" dediğimizde Kürt cephesinden hep Doğu Güneydoğu coğrafyası algılanır. Ama Orta Anadolu'da da Kürtlerin yaşadığı çok da bilinmez. Bilinenler de dar bir camiayla sınırlı kalır nedense! İşte sevgili Rohat Alakom bu zor işi başarmış. Hem araştırmacı kimliği ile iki defa bölgeye gidip mekânları dolaşarak, hem de sıkı bir kaynak taraması yaparak "Orta Anadolu Kürtleri" çalışmasını hazırlamış. 275 dip nottan oluşan Orta Anadolu Kürtleri üzerine yazılmış kaynakça ve 200 civarındaki eser isminden oluşan Orta Anadolu Kürtleri Bibliyografyası da bu alanla ilgilenenler için ayrı bir özgünlük taşıyor. Ayrıca kitabın sonuna eklenen aile albümlerinden alınan fotoğraflar da ayrı bir görsel zenginlik sağlamış kitaba. Orta Anadolu'ya Kürtler ilk kez Yavuz Sultan Selim döneminde yerleştirilir

(sayfa 20). Ve Ankara keçisinin asıl yetiştiricilerinin o dönemde yerleşen Kürtler olduğu da ifade edilir(sayfa 20). 1463 tarihli Ankara Tahrir Defterlerinde Kürt Köylerine rastlandığı yine yazarın aktardıklarıdır.(sayfa 34). 1861-72 yılları arasında Orta Anadolu'da araştırma yapan George Perrot, Haymana Kürtlerini yazar. Harputlu bir tercüman aracılığıyla ora Kürtleriyle anlaşılan Perrot "Yöre Kürtlerinin Kürtçe dışında başka dil bilmediğini" ifade eder. Perrot onlara "Orta Anadolu'ya ne zaman göç ettiklerini " sorar. Yaşlı Kürtler "Birkaç kuşak önce geldiklerini" söylerler. Perrot; "arka arkaya buralara (Orta Anadolu'ya) gelen kuşakların, sonbaharda dökülen ve savrulurken ortadan kaybolan yapraklar gibi arkalarında iz bırakmadıklarını" da ekler. (sayfa 22) George Perrot'un bu anlatımına genişçe yer veren Rohat Alakom'un kitabının ilgili sayfaları beni yakın zamanda bir yerel ve sözlü tarih çalışması için görüşme yaptığım yaşlı bir Diyarbakırlının Konya'da sürgündeyken ki anlatımlarına götürdü. Sürgünde doğan ve Konya'da daha ilkokul çağındayken bir gün Konya'nın dış mahallelerinden birinde, evlerinde konuştukları kendi dilleri (Kürtçe) gibi konuşanları gören çocuğun şaşkınlıkla babasıyla paylaşmasıyla ilintili. "Baba" der çocuk hem de Kürtçe sürgün yerinde, Konya'da. "Hani biz Kürtçe konuşuyoruzya! İşte burada(Konya'da) o Kürtçe konuşanları gördüm,

burada da var." "Evet" der babası. "Onlar Orta Anadolu Kürtleridir". Bilmediğim çok şeyi öğrendim. Bir dolu renkli ve bir çoğunuza tanıdık gelecek simalar da var Rohat'ın kitabında. Gazeteci Abbas Güçlü, İstanbul eski belediye başkanı Bedrettin Dalan, gazeteci Selahattin Duman, satranç ustası ve eski milletvekili Emrehan Halıcı gibi daha bir dolu önemli şahsiyetin de Orta Anadolu Kürtlerinden oldukları kitabın sayfaları arasında akıp gidiyor. Ki bir kısmının hikayeleri de var. Mehmet Kemal "Acılı Kuşak" kitabında Ankaralı Kürt Alişan Beyin konağından bozma İstiklâl ilkokulunu anlatır, Rohat da kitapta aktarır. Sonra ileriki yıllarda "Kürdün Meyhanesi"nde sıkça bir arada olduğu ve "Kürdümsü bir yüzü olduğu"nu ifade ettiği Cahit Sıtkı Tarancı'yı da anlatmayı unutmaz. (sayfa 56) Kastamonulu Bülent Ecevit'in Kürtlüğünü aktarmak da Süleyman Demirel aracılığıyla olur. Demirel Cüneyt Arcayürek'e anlatır. "Bülent Ecevit'in kökeni Tuncelili. Büyükbabası sürgün gelmiş Kastamonu'ya. Dersimli Mustafa". Dersimli Kürdizade Mustafa Şükrü Efendi 1924 yılında ölür ve "Kürdizade Şükrü Efendi" diye de mezar taşına yazılır. (s. 61) Rohat Alakom'un Orta Anadolu Kürtleri kitabını okurken yıllar önce Cem Boyner'in Yeni Demokrasi Hareketi Partisinden Ankara Milletvekili adayı olan Cihanbeyli Kürtlerinden bir akademisyen dostumun sö-

zlerini anımsadım. Gecenin epeyce geç bir saatinde beni aramış ve benim de aynı partiden Diyarbakır milletvekili adayı olmamı istemişti. Uygun bir dille olamayacağımı anlatmıştım. Sonra kendisine bu harekete ve siyasete bu şekilde heyecanla ilgisinin kaynağını sormuştum. "Kürtlerin Kâbe'si Diyarbakır'dır Şeyhmus" demiş ve eklemişti: "Müslümanlar nasıl yüzlerini Kâbe'ye dönüp ibadet ederlerse, dünyanın her hangi bir yerinde yaşayan Kürt de yüzünü Diyarbakır'a dönüp siyaset yapar. İşte bu nedenle Diyarbakır 300 araçlık konvoyla Cem Boyner'i hava alanından karşılamaya gidip sonra da koca salonlara sığdıramayınca, YDH'ye de kıymet verince bizler de Orta Anadolu Kürtleri olarak bu harekete sahip çıktık." Sözüyine kitaptan bir alıntıyla bitirmek istiyorum. George Perrot Kürtlerin geleceği konusunda şu saptamalarda bulunuyor. "Eğer onlar yüzyılımızda bir kez

uyanırlarsa acaba gözlerini çabucak kapatacaklar mı? Acaba insan böyle cömert ve iyi ırktan olan bir ulus için, mutlu bir gelecek dileğinde bulunamaz mı? Kürt Halkı şimdiye kadar istemini söylemiş değil. Doğal gücü olduğu gibi kalmış, hiçbir şey bu gücü bulandıramamış. Tüm yaşamı köylerde, yoksulluk içinde ve kahramanca geçmiş. Acaba bu ulus için mutlu bir gelecek umut etmeye hakkımız yok mu?" Perrot elbette bunları 140 yıl önce 1860'larda söylüyor. O günlerden bu yana geriye dönüp baktığımızda hâlâ sürgünler, hâlâ göçler, hâlâ acı ve hâlâ gözyaşı ve kan Kürtler adına, Kürtlerin defterine yazılandır. Rohat Alakom'un bir araştırmacı yazar titizliğiyle hazırladığı Orta Anadolu'da Kürtler kitabı, bir coğrafyanın sürgün ve uzun yerleşik sakinlerini anlatmada çok başarılı ve konuyla ilgilenenler için ise ciddi bir başvuru kitabı niteliğinde.

* Şeyhmus Diken'in bu yazısı aynı şekilde Radikal Gazetesi'nin 24 Dec 2004 tarihli kitap ekinde yayınlanmıştır.

* *Rohat Alakom, Orta Anadolu Kürtleri. Evrensel Basım Yayım. Haziran 2004. İstanbul. Birinci baskısı: Rohat Alakom, Şarktan Her Zaman Güneş Doğmaz-Orta Anadolu Kürtleri. Apec. 2003. Stockholm

"Kürt-Der tamamen Kürdi saiklerle hareket eden bir oluşumdur."

- *Sevgili İhsan Güler, genelde ilk soru şahsa yönelik olur. Bizde bu kaideyi bozmayalım. Ankara KÜRT DER başkanı İhsan Güler kimdir? Kendini tanıtır mısın?*

- Tabii neden olmasın. 1964 yılında Van'ın Başkale ilçesi Eleyiş köyünde dünyaya geldim. İlk, orta ve lise eğitimimi Başkale'de bitirdim. 1980 öncesi DDKD'nin üyesi olarak siyasi çalışmalarda bulundum. 1993 yılında faili meçhul cinayetlerin yoğunlaşması ve şahsıma yönelik baskı ve tehditler üzerine Ankara'ya yerleşmeye karar verdim. HEP, DEP, HADEP'de çalışmalarda bulundum. En son DEHAP Ankara Keçiören İlçe Başkanlığı yaptım.

- *KÜRT DER'in de kurucularındansın?!*

Evet, 19 arkadaşla birlikte Türkiye'de ilk defa Kürt ismiyle bir dernek kurma kararı aldık ve kurduk. Şu anda da derneğin genel başkanı olarak görevimi sürdürmekteyim.

- *Peki bu derneği kurmakta amacınız neydi? Neden KÜRT DER?*

- Senin de belirttiğin gibi 07.07.2004 tarihinde merkezi Ankara'da olmak üzere kuruldu dernek. 80 yıllık inkar ve asimilasyon politika-



larının Kürt halkı üzerinde yarattığı etkileri sanırım tek tek anlatmaya gerek yok. Bunlar biliniyor. Derin tahribatlar ile karşı karşıyayız. Mezopotamya coğrafyasının yerleşik halkı olan Kürtler binlerce yıllık güçlü bir tarihe sahip olmalarına karşın Lozan Antlaşması ile dört parçaya bölündü. Bu parçalarda Türk-Arap-Fars egemenliği altında çok hızlı bir asimilasyon politikası ile yok edilmek, kendi tarihinden kopartılmak durumu ile karşı karşıya bırakılmıştır Kürtler. Bu baskılar başta Kürt dili, tarihi, gelenek ve görenekleri üzerinde korkunç bir tahribat oluşturmuştur. Kürt-Der bu tahribatları en aza indirmek, Kürt dilini, tarihini, gelenek ve göreneklerini geliştirmek ve korumak için kurulmuştur.

- Söylediklerin vicdan sahibi hemen her Kürdün altını çizdiği şeyler. Türk tarafının bu taleplerinize tepkileri nasıl oldu? Devletin derneğinize yaklaşımı nedir? Hukuki prosedürde sorunlarımız oldu mu?

- Oldu. Halen de var. Ankara Valiliği sekiz aydır müracaat etmemize rağmen tüzüğümüzü onaylamamıştır. Derneğimiz ve 19 kurucu üyesi hakkında suç duyurusunda bulundu. İdari mahkemenin lehimize iki defa verdiği karar olmasına rağmen tüzüğün değiştirilmesi için 14. madde üzerinde değişiklik talebinde bulunmuştur. Buradaki amaçları tüzüğümüzün içeriğini boşaltmak ayrıca derneğin çalışmalarını engellemektir. Biz doğru bulduğumuz ilkeler doğrultusunda demokratik mücadelemi-

zi devam ettireceğiz. Bu arada tüm halkımızdan destek bekledeğimizi de belirtmeden geçmeyeyim.

- Laf açılmışken şunu sormak istiyorum. Sen de biliyorsun, bu zeminde partiler, vakıflar hatta yeni denilen projeler var. Bütün bunlara rağmen farklı bir oluşuma gidiyorsunuz üstelik lafı dolandırmadan kurumunuza KÜRT DER demişsiniz. Peki misyonunuz ne? Daha doğrusu Kürt Der'i ayrı kılan nedir?

- Kürd-Der bağımsız, demokratik, hiçbir siyasi ve ideolojik kurum ve kuruluşa bağlı olmayan tamamen Kürdi saiklerle hareket eden bir oluşumdur. Hangi siyasi görüş ve inançtan olursa olsun fark gözetmeden ilişki kurmak sağcı solcu ve din-



Kürt Der Genel Başkanı İhsan Güler ve Vahid Duran



İhsan Güler Kürt Der Genel Başkanı

ci ayrımlarına paye vermeden uzlaşa kültürünü geliştirip Kürdi değerler üzerinde bir araya gelme asli misyonumuzu oluşturuyor. Kalkış noktamızı bu çerçevede ifade edebilirim. Daha açıkcası birilerinin veya bir yerlerin izdüşümü değiliz.

- Basından takip ettim. ABD büyükelçisi derneğinizi ziyaret etti. Kuzey Kürdlerinin pek alışkın olmadığı bir durum. Sizce bu ziyaretin amacı neydi?

- ABD Büyükelçilik temsilcisi internet üzerinden derneğimizi duymuş. Türkiye’de ilk defa Kürt ismiyle açılan bir sivil toplum kuruluşu olmamız dikkatlerini çekmiş. Bizi daha yakından tanımak, derneğimizin çalışmalarıyla ilgili bilgi edinmek amacıyla bir tanışma ziyaretinde bulunmuşlardır. Diğer yanda ABD’nin

dünyanın tartışmasız süper gücü olduğu biliniyor. Dünyada her kesime ilgi gösterdiği gibi Kürtlere de ilgi göstermesi gayet doğaldır. Biz de bu ziyareti ilgi ve önemle kabul ettik.

- Derneğinizin üzerinde itina ile çalıştığı projelere geleceğiz. Unutmadan şunu sormak istiyorum. Bir Türk özel kanalında sanıyorum ismi Flash tv, tartışma formatında bir program var. Adı da “Kim Haklı”. Kürd aydınını temsilen Şahin Ayaz bulunuyor. Derneğinizle bir ilişkisi var mı Şahin Ayazın?

- Evet var. Şahin Ayaz derneğimizin hem kurucu üyesi hem de ikinci başkanı görevinde bulunuyor ve halen de bu görevi sürdürüyor.

- Peki tepkiler nasıl. Bu tip tartışma programlarına Kürd çevrelerinden ağır eleştiriler geliyor. Türklerin çizdiği sınır-

lar ve şartlar altında Kürdlerin kendisini açıkça ifade edemeyecekleri, bu tip şeylerin zarar vereceği, oyuna gelindiği yönünde görüşlerde var.

- Katılma daveti gelince katılıp katılmama üzerine çok durduk, tartıştık. Hatta rededilsin diyen arkadaşlarımız da oldu. Programın formatını hazırlayanların asli niyetini biliyoruz. Bu oyunu bozmak biraz da bizim performansımıza ve yeteneklerimize bağlıydı.

- Olsun. En azından "kendileri çalar, kendileri oynardı", bu anlamda hedefledikleri raytingi tutturamazlar program da gösterimden kaldırılırdı.

- Hayır denseydi belki de Kürd aydını diye bir korucubaşını veya işbirlikçi

birisini çıkarırlardı. Bu da daha kötü sonuçlar doğurabilirdi. Bütün bunlar bilinerek evet dendi. Nitekim gelen tepkileri göz önünde bulundurursak doğru bir karar verdiğimiz ortaya çıkıyor. Flash tv'deki *Kim Haklı* programına çıktığı günden beri halkımız tarafından çok yoğun ilgi var. Ülkenin her tarafından Şahin Ayaz arkadaşın duruşu ve söylemleriyle ilgili olumlu mesajlar alıyoruz. Bu konuda sizin vasitanızla halkımızın bu yoğun ilgisine de teşekkür ederiz. Bizden yardımlarının devamını esirgemesinler.

- Neyse, bunu işin uzmanlarına bırakalım. Kürd politolog ve sosyologlarının "türk medyası ve Kürdler" ekseninde söyleyecekleri bir çift söz vardır herhalde. Kısa ve



uzun vadeli projelerden bahs ettin. Nedir bunlar?

- Kolaylık olması açısından müsadene bazı başlıklar altında hızla sıralamak istiyorum. Her bir başlık tek başına üzerinde durmayı ve açılımı gerektiriyor:

- Kürt demografisinin değiştirilmesini belgelemek amacı ile projeler geliştirmek ve araştırmalar yapmak,

- Ana dilimiz Kürtçe konusunda ders ve kurslar vermek.

- Kürt tarihi, coğrafyası, geçmiş ayaklanmalar, kültür, sanat ve ebiyat üzerine panel konferans ve seminerler düzenlemek;

- Sokakta yaşayan çocukların eğitimi ve rehabilitasyonu ile ilgili projeler geliştirmek; (çöp-kağıt toplayanlar, tiner, bali kullanıcıları vs.) ile ilgili araştırmalar yapmak.

- Ankara'da Kürt öğrenci birimleri kurup, barınma burs v.s gibi sorunları araştırmada yardımcı olmak.

- Yine Ankara'da Kürtçe bir bültenin çıkarılması ve ücretsiz dağıtımı için kaynak araştırılması.

- Sağlık sorunu; muhtaç ve mağdur olan Kürt aileleri ve insanları için ilaç, doktor, tıbbi yardımlarda bulunmak ve bunun için bir birim oluşturmak.

- Orta Anadolu'da yaşayan yerleşik Kürt topluluğu ile ilgili araştırmalar yapmak ve bu konuda bir harita çalışması yapmak.

- Kürt mutfağı ve kıyafetleri ile ilgili tanıtımlarda bulunmak ve keremesler düzenlemek.

- Kürtçe dublaj ve spikerlik mesleklerine ilişkin çalışmalar yapmak, bu konuda eğitimsel kurslar açmak.

- Çocuklar için çizgi film dublajı, hikaye kitaplarının Kürtçe'ye çevrilmesi konusunda çalışmalar yapmak ve uzmanlık alanları yaratmak.

- Danışma kurullarının oluşturulması,(Hukuk, Sosyoloji, Tarih, Arkeoloji vs.).

- Geniş bir Kürt bilgi bankasının oluşturulması.

- Kürtçe,İngilizceçevirigruplarının oluşturulması.

- Resim, heykel, peyzaj, bıçki dikiş, folklor, müzik gibi meslek edindirme kurslarının açılması.

- Folklorik ve kültürel içerikte araştırmalar yapılması...

- Değiştirilen Kürt köyleri isimlerinin, tespiti için çalışmalar yapmak ve bu isimlerin yeniden iade edilmesi için hukuksal mücadele başlatmak.

- Kan bankasının oluşturulması.

- BM, ABD ve AB devletleri nezdinde resmî ve sivil toplum örgütleriyle sıkı diyaloglar kurup projelerin hayata geçirilmesi konusunda dayanışma ve desteklerin alınması için ciddi çalışmaların yapılması konusuna önem verilmesi.

- Bu projeleri duymak bile yürek hoplatıcı ve ferahlatıcı. Gayet iddialı projeler. Başarabilecek misiniz?

- Bir çok projenin ilk adımlarını atmış bulunuyoruz. Ankara'da bu işlerin altından kalkacak bir dinamizmin olduğunu da biliyoruz. Üstelik Orta Anadolu'da yerleşik bir Kürt nüfus da var.

- Oraya gelecektim. Konya, Kırşehir, Haymana Kürdlerinden derneğin kuruluşunda olan veya ilgi duyan varmı?

- Derneğimizin kurucu üyeleri arasında bu şehirlerden olanlar var.

Bu çerçevede yoğun bir ilgi ve ilişkiden bahsedebiliriz. Sen de bilirsin, hemen her şehirde yerleşik helde bulunan bir Kürt topluluğu var. Biz nüfusun 1,5 milyon civarında olduğunu tahmin ediyoruz. Farklı sebeplerden dolayı üçyüz dört yüz yıl önce bu coğrafyaya göç etmişler. Dillerini, gelenek ve göreneklerini unutmamışlar. Kürt kimliği konusunda oldukça inatçılar. Aslında bu örnek Kürtlerin ne gibi güçlü bir tarih ve kültüre sahip olduklarına bir kanıt olarak gösterilebilir. Derneğimiz Orta Anadolu Kürtleri'nin

güçlü karakteristik yapısını bir gurur kaynağı olarak görmektedir.

- Doğrusunu söylemek gerekirse hemşehrilerimin bu yakın ilgisine bende sevindim. Bir çok Kürdün zihnini derinliğine meşgul eden bir konuya gelmek istiyorum. Güney Kürdistanda ve Iraktaki gelişmeler konusu. Ankradan takip edebiliyormusunuz olan biteni. Bu konuda ne düşünüyorsun. Fikrini öğrenmek isterim.

- İlk önce güneydeki kardeşlerimize en derin selamlarımı iletirken mücadeleyi getirdikleri aşama açısından kutlamak istiyorum. Mam Celal'in

Irak cumhurbaşkanlığına gelmesini bölgedeki dik-

ta ve baskıcı rejimlerin eskisi gibi devam etmeyeceğine

kanıt olarak görüyorum.

Halkımızın Saddam katilinin şiddet ve imhasına maruz kaldığını biliyoruz. 16 mart

1988'de Halepçe'de katledilen insan-

larımızı unutmadık. Halkların kendi kaderlerini tayin

hakkı BM tarafından güvence altına alınmıştır. Güneydeki kardeşlerimizin de bu hakka sahip olduklarını tüm dünyanın kabul etmesi gerekir. Kürtler ortadoğuda barışın ve demokrasinin güvencesidirler.



- Bir ziyarette bulunmayı düşünüyormusunuz?

- Tabii. Bu konuda hazırlıklarımız var. Sanıyorum yakın bir zamanda Ankara Kürd Der olarak bir heyetle Güney Kürdistan'a bir ziyarette bulunacağız. Güneyli kardeşlerimizle ilişkilere önem veriyoruz.

- Şu bayrak meselesini geleceğim. Üç gündür Ankaradayım. Her taraf bayrak. Dışarıdan bakıldığında ilk söylenecek şey cinnet ve şizofreni halinin yaşandığı. Benim bildiğim bayrak düşmana çıkarılır. Nedir bu yaşananlar? Sana göre bu gelişmelerin ardında yatan niyet ne?

- Sen de görüyorsun müthiş bir milliyetçilik dalgası var. Ne denirse densin, farklı sebepler de olsa bu bayrağın kime karşı çıkarıldığını biliyoruz. Bu mesajı bizim gibi bir çok Kürt de almış bulunuyor. İşin bu hale gelmesinde veya getirilmesinde bir çok neden var. Türk milliyetçiliği güneydeki gelişmelerden sonderece rahatsız oldu. Özellikle Mam Celal'in Irak'a cumhurbaşkanı olacağı belli olunca ABD'ye söyleyecek bir şeyleri olmadığı için Kürtlere yükleniyorlar. Bir de 21 mart Newroz bayramında mily-onlarca insanın her tarafta büyük bir coşkuyla demokrasi, barış, kardeşlik ve eşitlik taleplerini ileri sürmeleri derin ve kirli ilişkiler içinde olan bu güçleri daha da ürkütmüştür. Türkiye'nin AB sürecinden ve ortadoğunun yeniden şekillendirilmesinden rahatsız olan

bu güçler Türk milliyetçiliğini yükseltmeye çalışarak ABD, AKP ve Kürtlere karşı bu tür provakasyonlarla toplumda güç kazanmak istiyorlar. Bu durum Kürtlerin birlik ve beraberlik içerisinde bir karşı duruşu ortaya koymalarını gerekli hale getirdiğini düşünüyorum.

